

Berhemên Giştî Yên

Molière

NEXWEŞÊ
NEXWEŞIYÊ

Molière

çrom

ŞANO

Weşanên Aram

AKTOR

ARGAN, nexweşê nexweşiyê.

BÉLINE, jina duduyan a Argan.

ANGÉLIQUE, keça Argan, û evîndara Cléanteyî.

LOUISON, keça piçûk a Argan, û xwişka Angéliqueyê.

BÉRALDE, birayê Arganî

CLÉANTE, evindarê Angéliquey

MÎRZA DIAFOIRUS, hekîm

THOMAS DIAFOIRUS, lawê wî, û evindarê Angéliqueyê.

MÎRZA PURGON, hekîmê Arganî.

MÎRZA FLEURANT, dermansaz.

MÎRZA BONNEFOY, noter.

TOINETTE, qewraşa Arganî.

Bûyer li Parisê derbas dibe

PERDEYA YEKEMÎN

Sehneya Yekê

ARGAN

Li jûra xwe bitenê li paş maseyekê rûniştiye, deftera deynan a dermansazî li ber e bi marqeyan* dijmêre û hesabê wî çêdike; di ber xwe de dipeyive û wiha dibêje: sisê û dudu dike pênc, û pêncê din dike deh, û dehê din dike bîst. Sisê û dudu dike pênc. "Her wiha, di bîst û çarê mehê de, piçek tenkiyeya** hêsanker, amadeker, û nermker, ji bo ter kirin, nerm kirin û hênik kirina nav û dilê Mirzayî." Tiştê Mirza Fleuranî, dermansazê min ê ku bi min xweş ew e, ku defterên xwe her dem pir bi zarekî şaristanî digre: "Nav û dilê Mirzayî, frank û nîvek". Erê, lê, Mirza Fleurant, şaristanîbûyîn bitenê têrê nake, divê mirov hinekî bi însaf jî be, û çermê nexweşan negriwîne. Ji bo tenkiyeyekê frank û nîvek! Na, nabe ez xulam, min berê jî ji te re gotibû. Te di defterên xwe yên din de bitenê frankek nivîsî bû, û frankek jî bi zarê dermansazan, mana xwe niv frank e; ev e, ji te re pêncî santîm. "Dîsa, heman rojê, tenkiyeyeke baş a paqijker, ku bi katoliconeke duqat, rêvas, hingivê gulan û hin wekî din, li gor reçeteyê hatiye amadekirin, da ku zikê piçûk ê Mirzayî bişo, maliş û paqij bike, frank û nîvek" Bi destûra te be, pêncî santîm. "Careke din, heman rojê, êvarê şirûbeke xweş a ji bo kezeba reş, bîhn firehker û xewmaşker, ji bo Mirza rihet rakeve, frank û heftê û pênc santîm." Dilê min bi vê naşewite, ji ber ku wê ez baş dixew vekirim. Pêncî, heftê û pênc, heştê, heştê û pênc santîm, şeşê dawîn. "Dîsa, di bîst û pênc-

* Marqe (jeton)ên gilover û wek hev in, ku ji bo mirov karibe pê hesab çêke tê bikar ananin.

** Tenkiye (clystère), bi latînî "clyster", tê mana şuştinê; lavman (şuştin) a ji bo paqijkirina made û rêviyan.

cê mehê de, li gor reçeteya Mîrza Purgonî, ji bo derxistin û valakirina ziravê Mîrzayî, dermanekî baş ê zikêşîkirin û bihêzkirinê, ku ji xiyarşembeyê teze yê li gel sînemakiya lovanten û hîn wekî din pêk tê, çar frank." Ax! Mîrza Florant, mana vê henekpêkirin e; divê mirov debara xwe bi nexweşan bike, lê qey Mîrza Purgonî di reçeteya xwe de destûra ku tu çar frankan binivîsî jî nedaye te. Balê te nivîsî jî .bû, ji kerema xwe re te sê frank binivîsandaya. Ha ji te re frank û nîvek bes e. Dîsa, heman rojê, şîrûbeke li dijî zikêşê û qebizker, ku Mîrza pê bîhna xwe vede, frank û nîvek." Baş e, heftê û pênc santîm. Dîsa, bist û şeş mehê, tenkiyeyeke ba belavker, ji bo bayê nava Mîrzayî jê bibe, frank û nîvek." Pêncî santîm, Mîrza Florant. "Dîsa, dubarekirina tenkiyeya Mîrzayî ya li jor ji bo êvarî, frank û nîvek." Mîrza Floran, pêncî santîm. "Her wiha, di bîst û heftê mehê de, dermanekî qenc ê ku ji bo Mîrza karibe bihêsanî pê biçê destavê û nava xwe rihet bike hatiye çêkirin, sê frank." Pir ba e, frank û nîvek. Ku hinekî însafa te hebe, dê serê min jî rihet be. "Dîsa, di bist û heştê mehê de, ji bo paqijkirin, saxkirin, hînîkkirin û sivikkirina xwîna Mîrzayî, firek ava parzinî ya şîrê birî, bişekir, frankek.", baş e, lê tu bibêje pêncî santîm. "Wekî din, kevçiyek şîrûba qewetê ya hêwişîner, ku li gor reçeteyê, ji duwazdeh bixurên bezoardî* yî du fankan heq bikî. Sisê û dudo dike pênc, û pênc dike deh, dehê din dike bist. Hemî li ser hev, şêst û sê frank û bist û du santîm û niv. Nexwe min vê mehê yek, dudu, sisê, çar, pênc, şeş, heft û heşt derman sitendine; û yek, dudu, sisê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yazdeh û duwazdeh lavman dane çêkirin; û meha berê jî duwazdeh derman û bîst lavmanên din hebûn. Loma ez xwe vê mehê weke ya din baş his nakim. Ez ê ji Mîrza Purgonî re bibêjim, bila vî karî sererast bike. Heydê, van tiştan hemîyan ji ber min hilînin. Kesek tune: ez ji kê re dibêjim, hertim min bitenê dihêlin; ez wan girêbidim jî li cem min nasekinin. (Ji bo merivên xwe li xwe vehewîne li zingil dixê.) Qet deng naçe wan, dengê zigilê

* Ava lîmon û hinarê, û hîn tiştên din pêk hatiye, pênc frank. Wey! Mîrza Floran, tîka ye, hêdî bajo; ger tu wiha xwe biêşîni, dê kesek nexwaze nexweş bikeve: bi çar frankan razî bibe, ku tu kari Kevirê bijikiyê yê jahrukuj.

min jî baş dernakeve. Zing, zing û zing: beleheq e. Zing, zing û zing: tu dibêjî qey ker bûne. Toinette! Zing, zing û zing : tew we-ke ku ez li zingil naxim. Kuçik, dêlik! Zing, zing û zing: van ez dîn û har kirim. (*Êdî nema li zingil dixê, diqîre.*) Zing û zing û zing: qaltax, tu çûyî cahnima xwe! Tiştê wiha kesekî dîtiye, mirov nexweşekî wiha belengaz bitena serê wî dihêle. Zing, zing, zing: ez rebenê Xwedê ez ê çi bikim! Zing, zing, zing: ax, ji bo Xwedê! Ez li vir bimrim jî kesek li min ho venade. Zing, zing, zing.

Sehnaya Duduyan

(Toinette, Argan)

TOINETTE

dikeve jurê: Ez hatim.

ARGAN

Ax, dêlik! Ax, qaltax...!

TOINETTE

Weke serê xwe li derekê xistibe dike: Naleta şeytên li vê bêsebriya te bê! Ji ber heydada ku tu li mirov datînî, min serê xwe bi awayekî wiha li qoziya pencerê xist ku çîk ji ber çavên min çû.

ARGAN

Bi hêrs: Ax! nemerda heram..!

TOINETTE

Ji bo ku rê li ber peyva wî bigire û nehêle ku biqîre, her dilê xwe bi xwe dişewitîne û dibêje: Ax!

ARGAN

Ev saetek...

TOINETTE

Ax!

ARGAN

Ev saetek e...

TOINETTE

Ax!

ARGAN

Te ez li vir bitenê hiştim...

TOINETTE

Ax!

ARGAN

Hiş bê, qewad, hiş be ku ez ê aniha mirina te bînim.

TOINETTE

Baş e welleh! Tiştê ku min bi serê xwe de anî ne bes e, îcar dorra te ye.

ARGAN

Te qirika min bi xwe re qetand, qewad.

TOINETTE

Min jî serê xwe ji ber te şikand: yek ket bedêla yê din; em ji ber hev, ku tu bixwazî.

ARGAN

Te got çi? Rûreş...

TOINETTE

Ku tu bi min re wiha bixeyidî, ez ê ji ber te bigirîm.

ARGAN

Min dihêle û diçe, pîsa heram...

TOINETTE

Hertim ji bo ku rê li ber peyva wî bigire.

ARGAN

Dêlik, tu dixwazî...

TOINETTE

Ay!

ARGAN

Çi? Qey tu yê nehêlî ku ez çend xeberên wiha baş ji te re bidim û dilê xwe jî li te rihet bikim.

TOINETTE

Bide bavo, ku dilê te pê rihet bibe, ne lazim e, ez dengê xwe nakim.

ARGAN

Tu nahêlî, dêlik, her car û nîv tu xwe di ber peyva min radikî.

TOINETTE

Ku dilê te bi şerkirina bi min re rihet bibe, her divê ez jî ji hina-
va xwe ve dilê xwe bi girî rihet bikim: ji her kesî re bi awayekî
diqede, Xwedê nehêle. Ax!

ARGAN

Heydê, ne tu bî ne giriyê te be. Van tiştan rake ji ber min, qewad,
rake zû. (*Argan ji ser kursiya xwe radibe.*) Gelo lavmana min a
îro baş bikêr hatiye?

TOINETTE

Lavmana te?

ARGAN

Erê. Aya min baş zahferan derxistiye?

TOINETTE

Wellehî, ez qet têkilî van karan nabim: Ev karê Mîrza Fleurantî ye,
piştî ku ew jê fêdê dibîne bila ew difna xwe têxê.

ARGAN

Bila zû ji min re avê germ bikin, divê ez bisteke din lavmana xwe
ya din jî çê bikim.

TOINETTE

Ev Mîrza Fleurant û Mîrza Purgonê te bitene ji xwe re bi cesedê
te dilîzin; te ji xwe re kirine çêleka dotinê; min pir dixwest ku ez
ji wan bipirsim bê nexweşiya te çi ye, ku ew derman bi te didin
xwarin.

ARGAN

Hiş be, naşiya kawik, kontrola reçeteyên doktorî bi serê te neke-
tiye. Ka ji min re bangî keça min Angéliqueyê bikin bila bê, ez ê
jê re tiştêkî bibêjim.

TOINETTE

Wa ye, tu dibêjî qey tiştê ku tu fikiriyî niqutiye dilê wê, ew bi xwe tê vir.

Sehneya Sisêyan

(Angèlique, Toinette, Argan)

ARGAN

Were, Angélique; tu tam di wexta xwe de hatî: min jî dixwest ku ez bi te re bipeyivim.

ANGÉLIQUE

Ez amade me, guhdariya te dikim bavo.

TOINETTE

Henekê xwe pê dike: Heydê zû, Mîrza, zû bike. Mîrza Fleurant ji me re karan ji ber piyên me ve derdixe, îcar destavok ji me kê mabû.

Sehneya Çaran

(Angèlique, Toinette)

ANGÉLIQUE

Bî awireke xemgîn weke bixwaze ya dilê xwe jê re bibêje dinêre, Toinette.

TOINETTE

Çi ye?

ANGÉLIQUE

Ka li min binêre hinekî.

TOINETTE

Va ye! Ez li te dinêrim.

ANGÉLIQUE

Toinette.

TOINETTE

Baş e, çi bûye, «Toinette», «Toinette»a te ye?

ANGÉLIQUE

Tu wiha xwe ji bin derdixî, tu nizanî ku ez dixwazim çi ji te re bibêjim?

TOINETTE

Bêgûman, tu yê dîsa bahsa xortê me yê evîndar bikî; jixwe ev serê şeş rojan e, hemî gotûbêja me bûye ew; her saetê carekê ku tu jê xebermedî dilê te rihet nabe.

ANGÉLIQUE

Madem tu vê yekê zanî, çima tu beriya min bahsa wî nakî û min ji vî ezabî ku heta ez peyvê bînim ser xelas nakî?

TOINETTE

Ma tu fersendê didî mirov, hişê te her maye li ser wî ku tu jê xeber bidî, kî dikare beriya te bahsa wî bike.

ANGÉLIQUE

Ez nikarim ji te veşêrim, ez bixwe nikarim ku ez ji te re bahsa wî nekim û ku ez ji te re dilê xwe venekim ez ê biteqim. Lê ka ji min re bibêje, Toinette, ji ber vê hezkirina min nexwe tu henekê xwe bi min nakî newiha?

TOINETTE

Hedê min e, ku ez henekê xwe bi te bikim.

ANGÉLIQUE

Gello ez nebaş dikim, ku ez xwe bi van hissên wiha şêrîn ve berdidim?

TOINETTE

Min tişteki wiha negotiye.

ANGÉLIQUE

Te dixwest ku ez li hemberî wan ahd û wad û gotinên ku nîşana agirê dilê wî yê ji bo min e, bêhis bimînim?

TOINETTE

Xwedê neke gidî.

ANGÉLIQUE

De ka ji min re bibêje, tu jî wekî min, tişteki xwedayî, qedereke îlahî di wê serpehatiya ku kesî nedipa, ya hevnasîna me de nabî-nî gello?

TOINETTE

Belê.

ANGÉLIQUE

Bêyî ku min nas bike, rabûna wî ya li ber barê parastina min, tu weke reftareke esîlane nabîn?

TOINETTE

Belê.

ANGÉLIQUE

Ma ev ne nîşana tevgereke ciwamêrane ye?

TOINETTE

Xebera te ye.

ANGÉLIQUE

Û ev tişt hemî bi awayekî pir kubar û lirê kir ne wiha?

TOINETTE

Erê, lê.

ANGÉLIQUE

Li ser bextê te, Toinette, bi te jî ne xortekî bedew û lihevhatî ye?

TOINETTE

Belê, çawa.

ANGÉLIQUE

Kesekî weke wî heye li rûwê vê dinyayê?

TOINETTE

Bêgûman tuneye.

ANGÉLIQUE

Weke tevger û tepeşa wî, di axaftina wî de jî esaletek heye ne wiha?

TOINETTE

Şik tuneye.

ANGÉLIQUE

Aya dibe ku mirov karibe tiştêkî ji wan hemî peyvên ku ji min re gotin şêrîntir û germtir bibihîze?

TOINETTE

Na, nabe.

ANGÉLIQUE

Tiştêk ji vê zordestiya ku ez tê de dijîm diwartir heye, ku rê û dirb li ber hemî danûsitendina me her du kesên ku bi agirê besteke Xwedayî bi hev ve hatine girêdan girtiye?

TOINETTE

Gotina te ye.

ANGÉLIQUE

Lê, Toinetteya min a delal, tu bawer dikî ku birastî jî weke ji min re dibêje ji min hez dike?

TOINETTE

Ez çî bêjim! Tiştên wiha, carinan, divê mirov zêde baweriya xwe bi wan nîne. Evînên xapînok jî carinan dişibin yêrasteqîn; û min gelek komediyên dilkevir di vî warî de dîtine.

ANGÉLIQUE

Ax! Toinette, tu ji xwe re çî dibêjî? Mixabin! Bi awayekî wiha dipeyivî ku, gelo dibe ku ji min re rastiya dilê xwe negotibe?

TOINETTE

Di her hal û karî de, nedûr nêzîk tu yê rastiyê bibînî; û piştî ku di nameya xwe ya doh de gotiye ku wê bê te ji bavê te bixwaze, ev riya heytî kurt e, em ê bibînin bê rast dibêje yan derewan dike: Ji vê çêtir îsbat tune.

ANGÉLIQUE

Ax! Toinette, ku ew jî min bixapîne, ez ê di jiyana xwe de bawerîya xwe bi tu mêrî nînim.

TOINETTE

Ev e, bavê te vegeriya.

Sehneya Pêncan

(Angélique, Toinette, Argan)

ARGAN

Li ser rûniştêka xwe rûdinê. Hela vir de, keça min, ez ê ji te re tiştêkî bêjim, tiştêkî ku belkî heta niha qet nehatibe hişê te, jî. Wexta te û zewacê ye, te ji min dixwazin. Ev çi ye, tu çima dikenî? Ez dizanim, peyva zewacê bi mirov xweş tê; tew ji bo keçên xame, tiştêkî ku jê bêtir karibe wan bidingîqîne tune. Ax! Xweza, xweza! Biqende ku ez dibînim, keça min, ez dibêm tew ne hewce ye ku ez bipirsim, bê tu jidil dixwazî bizewicî yan na.

ANGÉLIQUE

Divê ez biya te bikim, bavo, her tiştê ku bi dilê te be bitenê tu emir bike.

ARGAN

Ji ber ku keçeke min a ewqas sernerm û biya mezinên xwe dike heye ez gelekî bextewer im. Wê gavê mesele hal bû çû, ji xwe min jî berê soz dabû.

ANGÉLIQUE

Wey, tu ji xwe re çi dibêjî bavo, her tiştê ku tu bixwazî divê ez çavgirtî bikim.

ARGAN

Xanima min, jinbava te, dixwest ku ez te û xwişka te ya piçuk Louisonê jî li ser rîya heq perwerde bikim û ev yek ji zû ve xistibû serê xwe.

TOINETTE

Di ber xwe de: Kî dizane bê li çi fikiriyê zikreşa xayîn.

ARGAN

Qet nedixwest ku ev zewac here serî, lê min guhdariya wê nekir û min biryara xwe da çû.

ANGÉLIQUE

Ax! Bavo, ez ê çawa ji bin barê van qencyên te derkevim.

TOINETTE

Li arganî vedigerîne: Bi rastî kêfa min jî ji vê yekê re pir hat û bi min tiştê herî baş ku te di jiyana xwe de kiriye ev e.

ARGAN

Min hîn mirovê ku tu yê pê re bizewicî nedîtiye, lê ji min re gotin ku ez ê biecibînim û tu yê jî.

ANGÉLIQUE

Helbet, bavo.

ARGAN

Çawa nexwe te ew dîtiye?

ANGÉLIQUE

Piştî ku bi rîza te ye jî, bi destûra te be, ez ê dilê xwe ji te re vekim bavo, tiştê ji Xwedê ve xwiyaye ez ê çima ji te veşêrim, beriya niha bi şeş rojan bi tesadufekê me hev naskir û sebeba ku îro hatine min ji te dixwazin jî, ji ber ku hîn cara pêşî gava me hev dît xwîna me li hev keliya.

ARGAN

Kesî ji min re tiştêkî wiha negot; lê ez bi vê yekê kêfxweş bûm, wiha belkî hîn çêtir û bixêrtir be. Dibêjin xortekî girîgirs û pir bedew e.

ANGÉLIQUE

Erê, bavo.

ARGAN

Bejin û bala wî jî li hev e.

ANGÉLIQUE

Qet şik tune ye.

ARGAN

Mirovekî xwîn şêrin e.

ANGÉLIQUE

Rast e.

ARGAN

Kesek di hisna wî de tune ye.

ANGÉLIQUE

Pir lihevhatî ye.

ARGAN

Giran û haveynê wî paqij e.

ANGÉLIQUE

Heta tu bixwazî.

ARGAN

Pir biterbiye ye.

ANGÉLIQUE

Li rûwê vê dinyayê kesekî wek wî biterbiye tune ye.

ARGAN

Latînî û grekî jî xweş xeber dide.

ANGÉLIQUE

Min ev yek nizanibû.

ARGAN

Di nav sê rojan de wê bibe doktor.

ANGÉLIQUE

Ew, bavo?

ARGAN

Erê, ma ji te re qet bahs nekir?

ANGÉLIQUE

Na birastî. Baş e, kê ji te re got bavo?

ARGAN

Mîrza Purgonî got.

ANGÉLIQUE

Ma Mîrza Purgon wî nas dike?

ARGAN

Xweş bazar e! Çawa nas nake, ma ne xwarziyê wî ye.

ANGÉLIQUE

Cleante, xwarziyê Mîrza Purgonî ye?

ARGAN

Kîjan Cléante? Em bahsa mirovê ku dê te jê re dixwazin dikin.

ANGÉLIQUE

Hi! Erê.

ARGAN

Erê lê, yê ku wê te bistîne xwarziyê Mîrza Purgonî, kurê zavayê wî yê doktor, Mîrza Diafoirusî ye; û navê lêwik jî Thomas Diafoirus e, ne Cléant e; min, Mîrza Purgon û Mîrza Fleurantî, me vê sibê biryara vê zewacê da û sibê jî bavê vî xortê ku dê bibe zavayê min divê wî bîne bi min bide naskirin. Çi bû? Tu çima wiha şaş û mat mayî?

ANGÉLIQUE

Ewkî, bavo, ez dibînim ku te bahsa kesekî din kiriye û ez jî yekî din têgihîtime.

TOINETTE

Çawa? Mîrza, tu çawa dikarî tişteki wiha, ku xwe bikî pêkeniyê herkesî bifikirî? Tu xwediyê ewqas mal û milk î, tu dixwazî keça xwe bi doktorekî re bizewicînî?

ARGAN

Erê. Tu çima her gav xwe di ber tiştê ku ne karê te ye radikî, qewada heram, çi bi serê te ketiye?

TOINETTE

Ji bo Xwedê! Hêdî be, wiha meqûre: tu çi hakhaka dest bi dijûnan dikî. Bêyî ku tu xwe hêrs bikî, qey em nikarin bi hev re ji xwe re di mala xwe de du gotinan bikin? Ka, em ji xwe re bêsergermî bipeyivin. Tu ji bo çi zewaceke wiha dixwazî, ji kerema xwe re ka ji me re jî bibêje?

ARGAN

Ji ber ku, ez dinêrim ku ez mirovekî nexweş û seqet im, ez dixwazim zava û xizmên min ên doktor hebin, ku li hemberî nexweşiya xwe ez karibim hawar û gaziya xwe bibim wan, di mala xwe de xwediyê jêdera dermanên ji bo min pêdivî bim, da ku kîjan gava bixwazim karibim reçeteyan peyde bikim û derdê xwe derman bikim.

TOINETTE

Ha wiha were ser rê, binêre te milamê xwe çi xweşik got, tu dibînî ku em wiha xweşik bi hev re bipeyivin çendî xweş e. Lê, Mîrza, destê xwe deyne ser bextê xwe û bibêje: Aya bi rastî jî tu nexweş î?

ARGAN

Tu ji xwe re li min û vê qewadê, ji min re dibêje tu bi rastî jî nexweş î? Ma ez ne nexweş im, qaltax?

TOINETTE

Mexeyide Mîrza! Erê tu nexweş î ez bigorî, ji bo vê jî ji me re şerekî dermexe; erê tu pir nexweşî, ez jî bi te re, him jî tu nizanî ku tu çendî nexweş î, me fêm kir, tu niha naşemirînî. Lê divê keça te ji bo xwe mêrekî bike; him, tu nexweşiyeke wê jî tune, ne mecbûr e ku bi doktorekî re bizewice.

ARGAN

Ez wê ji bo xwe didim vî doktorî; him keçeke şîr helal divê bêvir de wê de yekî ku bi kêrî tenduristiya bavê wê bê bike.

TOINETTE

Ji bo Xwedê! Mîrza, tu dixwazî ku ez weke dostekê şîretekê li te bikim?

ARGAN

Ka bêje, em binêrin bê şîreta te çi ye?

TOINETTE

Vê zewaca han ji hişê xwe bavêje.

ARGAN

Baş e, sebeb?

TOINETTE

Sebeb ew e, ku keça te di dinyayê de bi tiştekî wiha qayil nabe.

ARGAN

Di dinyayê de qayil nabe?

TOINETTE

Na.

ARGAN

Keça min qayil nabe?

TOINETTE

Erê keça te. Ez dizanim ku ew ê ji te te bibêje, min Mîrza Diafoirus navê, ne lawê wî Thomas Diafoirus û ne jî hemî Diafoirusên dinyayê.

ARGAN

Karê min heye, ez nikarim bi bende we kevim, him qismetekî wiha hergav nayê dest. Ji vî lawê Diafoirusî pê ve tu wêrisên wî tunene; bi ser de jî, Mîrza Purgonê kordunde yê ku jina wî jî tune ye, hemî hebûna xwe bi sedema vê zewacê dide wî; him Mîrza Purgon zilamekî wiha ye ku hatiniya wî ya salê ne di bin heft hezar frangî de ye.

TOINETTE

Ji bo ku ew dewlemend bibe, kî dizane bê salê dikeve xwîna çend nexweşan.

ARGAN

Ger em hatiniya bavê lêwik nehesibînin jî, heft hezar frang bite-nê jî ne tiştêkî hindike.

TOINETTE

Mîrza, ev tişt hemî baş û xweş in; lê ez ê dîsa bêem ser gotina xwe: em xwebixwe ne, ez ji te re şîreta dê û bavan dibêjim, ji keça xwe re mêrekî din peyde bike, ew ne ji wan keçên ku bibe Xanim Di-afoirus e.

ARGAN

Ez dixwazim ku bibe.

TOINETTE

Ehe weyla! Te li vir got, li cîhekî din mebêje.

ARGAN

Çawa ez li cîhekî din mebêjim?

TOINETTE

Hema wiha mebêjê!

ARGAN

Him çima ez li cîhekî din mebêjim?

TOINETTE

Dê ji te re bêjin tu nizanî ku çi ji devê te derdikeve.

ARGAN

Kî çi dibêje bila bibêje; lê ez ji te re dibêjim, ku bila ew gudariya sozê ku min daye bike.

TOINETTE

Na. Ez baş dizanim ku ew ê neke.

ARGAN

Ez ê bi zorê pê bidim kirin.

TOINETTE

Ew ê neke, ez ji te re dibêjim.

ARGAN

Ew ê bike, nexwe ez ê wê bidim ber dêrekê.

TOINETTE

Tu?

ARGAN

Erê ez.

TOINETTE

De baş e.

ARGAN

Çawa "baş e"?

TOINETTE

Tu qet nikarî wê bidî ber dêrmêran.

ARGAN

Ez qet nikarim wê bidim ber dermêran?

TOINETTE

Na.

ARGAN

Na?

TOINETTE

Nâ.

ARGAN

Weh! Tu ji xwe re henekê xwe dikî: Ku ez bixwazim, çawa ez nikarim keça xwe bidim ber dêrekê?

TOINETTE

Min ji te re got, na.

ARGAN

Kî dikare bi destê min bigire?

TOINETTE

Tu bixwe.

ARGAN

Ez?

TOINETTE

Erê, nexwe dilê te kevir e.

ARGAN

Tu yê bibînî bê ez karim an nikarim.

TOINETTE

Tu ji xwe re henekan dikî.

ARGAN

Ez qet henekmenekan jî nakim.

TOINETTE

Dilovaniya bavîtiyê dê dest û piyên te girêbide.

ARGAN

TOINETTE

De bila çend hêsirmêsiran bibarîne, destê xwe li stuyê te bialîne, bi zarekî şêrîn "bavê min î kin û grover" bêje û bibilîne bidilovanî, em ê bibînin ku tu nerm dibî yan nabî.

ARGAN

Kesek nikare min ji ser yek û duduya min bîne xwar.

TOINETTE

Belê, belê tu yê niha bibînî.

ARGAN

Min ji te re got ku kesek jî nikare min ji ser rîya min vegefîne.

TOINETTE

Wiha van forsan mede xwe.

ARGAN

Qet mebêje ku ez "forsan" didim xwe.

TOINETTE

Ji bo Xwedê! Hiş be, ez te nas dikim, tişteke di dilê te de tune ye.

ARGAN

Bihêrs dibêje: Dilê min qet ne safî ye û gava ku ez bixwazim ke-
sek ji min xirabtir tune ye

TOINETTE

Wiha zû hêrs mebe, Mîrza. Ma tu li xwe nafikirî ku tu nexweş î.

ARGAN

Ez vir de wê de qet nizamim, ez emir dikim, ew ê mêrê ku ez dix-
wazim bike, bila ji niha ve xwe amade bike.

TOINETTE

Ez jî di jiyane de qet nahêlim ku ew tişteki wiha bike.

ARGAN

Xwiya ye te jibîra kir ku tu li ber deriyê kê yî? Te ev ceger ji ku
girtiye, qewadeke qewraşa wek te çima karibe li hember xwedî-
yê xwe van zimandirêjîyan bike?

TOINETTE

ARGAN

Bera pey Toinetteyê dide: Wey! Bêşîreta heram, tu bisekine ku ez
mirina te bînim.

TOINETTE

Xwe ji nav destê wî xelas dike: Tu çi jî bikî, karê min e ez ê tim
li dijî tiştên ku te bêrûmet bikin derkevim.

ARGAN

Gopalê wî di destê wî de, bihêrs, bi pey ketiye û wê li dora rûnîteka xwe dibe û tîne: Tu bisekine ku ez nîşanî te bidim bê karê zimandirêjên wek te çi ye.

TOINETTE

Bibazdan, xwe ji ber dide alî, çivekê didiyê diçe aliye rûniştekekê yê din: Karê min e, divê ez nehêlim ku tu dînîtiyekê jî bikî.

ARGAN

Dêllik!

TOINETTE

Na, dinya jî li serê min rabe ez nahêlim ku ev mahr pêk were,

ARGAN

Qaltax!

TOINETTE

Ez di dinyayê de nahêlim ku mahra wê li Thomas Diafoirusê te bê birîn.

ARGAN

Kotiya heram!

TOINETTE

Him ew ê jî ji te bêtir biya min bike.

ARGAN

Angélique, tu niha ji min re vê qewadê nagrî.

ANGÉLIQUE

Wî! Bavo xwe mewestîne, tu yê nexweş bikevî.

ARGAN

Ku tu wê ji min re negirî, ez keda xwe li te helal nakim.

TOINETTE

Ku bi ya te bike, ez ê jî wê ji mîratê xwe bêpar bihêlim.

ARGAN

Xwe bera ser rûnîteka xwe dide, hingî ku li pey Toinetteyê baz-

daye westiya ye: Ax! Ax! Ez ji hayho ketim. Ev qewad dê min rojekê bikuje.

Sehneya Şeşan

(Bêline, Angèlique, Toinette, Argan)

ARGAN

Ax! Xanima min, were ba min.

BÉLINE

Çi bi te hatiye, delalê min.

ARGAN

Were xwe bighîne hewara min.

BÉLINE

Çi bûye, çi bi te hatiye, bexê min.

ARGAN

Cana min.

BÉLINE

Hevalê min.

ARGAN

Hatin ez hêrs kirim!

BÉLINE

Wax gidî! Çi bi mêrê min ê naşî yê belengaz kirine. Ev çi hal e, jaro hevalo.

ARGAN

Ev qewada Toinetteya te, van rojan yekcar har bûye nema tê zeftê.

BÉLINE

Tu qet xwe hêrs meke, heyrana te me.

ARGAN

Wê ez dîn

BÉLINE

Tu bîhna xwe fireh bike, lawê min.

ARGAN

Ev saetek zêde ye, min xwest ez çi bikim ew li dijî min derket, li ber min rabû.

BÉLINE

Wax mala min şewitî, tu bîhna xwe teng meke.

ARGAN

Him bi rûyekî rûşûştî ji min re got ku xwedêgiravî ez qet ne nexweşmexweş im.

BÉLINE

Lewçetî, çortî kirye.

ARGAN

Tu dizanî, cegera min, ez di çi rewşê de me.

BÉLINE

Erê, kezeba min, ew li te ayil e.

ARGAN

Evîna min, ev qaltaxa han dê rojekê min bikuje.

BÉLINE

Wer mebêje, ew çi gotin e!

ARGAN

Ew sedema vê hemî dewxbûna min e.

BÉLINE

Tu jî ewqasî xwe aciz meke Xwedê jê razî.

ARGAN

Him ji kengî ve ye, nizamim, ku ez ji te re dibêjim min jê xelas bike.

BÉLINE

Tu Xwedê! Lawê min, ma êdî xulam û qewraşên ku kêmasiyên wan tunebin qet mane? Hin caran mirov mecbûr dimîne, ku ji bo xatirê qencyên wan çavê xwe ji kêmasî û çortiyên wan re bigire. Ev jinik bikêrhatî, nişmî, jêhatî û bi taybetî jî dilsoz e; û tu dizanî vî zemanî ji bo kesekî ku mirov bigre navmala xwe divê mirov pir bi tedbîr be. Hê! Toinette.

ARGAN

Fermo Xatûn.

BÉLINE

Ka bêje, gelo te çima mêrê min ewqas hêrs kiriye?

TOINETTE

Bi zarekî şêrîn: Min, Xatûn? Baweriya te ji Xwedê be, ez tê nagihêm ku tu dixwazî ji min re çi bibêjî û ji bo hertiştî jî ji xeynî razikirina Mîrzayî pê ve guhê min ne li ser tiştêkî din e.

BÉLINE

Ax! Tu çima wiha xayîn î!

TOINETTE

Ji me re got ku ew dixwaze keça xwe bizewicîne bide kurê Mîrza Diafoirusî; min jî bersiva wî da û got ku ez jî, vê mahrê ji bo keçikê bixêr dibînim; lê ku tu wê bidî ber dêrmêrekê dê hîn baştir bibe.

BÉLINE

Tiştêkî xirab di vê yekê de tune ye û ez jî dibêjim xebera jinikê ye.

ARGAN

Ax! şêrîna min, tu ji wê bawer dikî û ji min nakî. Tu qewad weke wê hene ji sibê de sed peyv û gotin ji min re kririn.

BÉLINE

Helbet! Ez ji te bawer nekim ez ê ji kê bawer bikim, dosto. Tu ji

xwe re li rihetiya xwe binêre. Guhdarî bike Toinette, ku tu careke din mêrê min hêrs bikî, piyê te li ber vî deriyî namîne. Ka zû, qapûtê wî yê bi kurk û wan mînderkan bide min, ku ez jê re rûnişteka wî bikeys bikim. Tu ji xwe re binêrin tiştê ku anîne serê mêrê min. Kumê xwe baş bikişîne serê xwe daxe heta ser guhên xwe. Tiştêkî din bi qende gava ku guhê mirov bicemidin nikare mirov bahorî bike.

ARGAN

Ax! Xezala min, ez ê çawa karibim rojekê ji bin barê vê hemî qenciya ku tu bi min dikî derkevim!

BÉLINE

Ji aliyekî ve mînderkên ku dide dora Arganî bikeys dike û ji aliyê din ve dibêje: Tu ka rabe ku ez vê mînderkê têxim bin te. Vêya bigre ku tu pala xwe bidî ser û vê jî bide ber kêleka xwe ya din. Ka em vêya bidin ber pişta te û ya din jî têxin bin serê te.

TOINETTE

Minderekê bi hêl li nav serê wî dixê û paşê direve: Ha ji te re ev jî ji bo ku tu serê xwe ji serma êvarê bi parêzî.

ARGAN

Bi hêrs ji cîhê xwe çeng dibe û hemî mînderkan taveje Toinetteyê: Wey! Qaltaxa heram qey tu dixwazî min bifetisînî.

BÉLINE

Hela, rawest e! Çi bû, çi bi te hat dîsa?

ARGAN

Bihnefişkek lê ketiye, xwe bêhevd berda ser rûnişteka xwe dibê: Ax, hawar e, Xwedê! Ez nema karim debar bikim.

BÉLINE

Tu çima ewqas hêrs dibî? Qey wê jî gotiye ez tiştêkî baş dikim.

ARGAN

Tu were ji min bipirse, evîna min, tu nizanî ku ev benestubibe çi beraz dola berazan e. Vê heşê min ji serê min bir, ez ji eyar derxistim; him ji bo ku ez karibim heta careke din bi ser hişê xwe

de werim, bi kêmanî divê ez niha heşt dermanê zikêîkirinê bistî-
nim û duwazdeh lavmanan bidim çêkirin.

BÉLINE

Lo, lo, ez bigorî, tu jî hinekî rihetiyê bide xwe, bihna xwe fireh
bike.

ARGAN

Yarê, hemî sebra dilê min tu yî, tu jî nebûya min ê çî xwelî li se-
rê xwe bikira.

BÉLINE

Weyla belengazî berxê min ê piçûk.

ARGAN

Ez dizanim ku ez çendî deyndarê vê dilovanî û evîna te ya ji bo
min im, dilê min, ez dixwazim, weke min ji te re gotibû, wesiye-
tên xwe bikim.

BÉLINE

Ax! Yarê min, careke din bahsa tiştêkî wiha meke, ez hêviyê ji te
dikim. Fikra tiştêkî wiha bitenê jî dilê min têşîne; û peyva wesiye-
tê pirçûnekan bi canê min dixê, ez nikarim ji ber êşeke wiha de-
bar bikim.

ARGAN

Min ji te re got ji bo vê yekê bi notêrê xwe re bipeyive.

BÉLINE

Va ye li hindur e, min ew bi xwe re anîbû.

ARGAN

Gazî bike bila bê vir, evîna min.

BÉLINE

Mixabin! Dostê min, dema ku mirov ji mêrekî pir hez dike, qet
tiştên wiha nayên bîra mirov.

*Sehneya Heftan**(Notêr, Bêline, Argan)*

ARGAN

Vir de we re, Mîrza Bonnefoy, biqedim e. Ji kerema xwe re, rû-ništekekê bigre were rûnê. Mîrza, xanima min ji min re got ku tu mirovekî pir rast î û her wiha jî yek ji dostên wê yê herî baş î; û ji bo wesiyetên xwe min jê xwest ku bi te re bipeyive.

BÉLINE

Ax! Ez qet nikarim tiştên wiha bînim ser zimanê xwe jî.

NOTÊR

Mîrza, wê ji min re niyeta dilê te vekir û tiştê ku tu dixwazî jê re bikî jî ji min re got; lê divê ez ji te re vê yekê bêjim ku tu bi wesiyeta xwe nikarî tişteki ji jina xwe re bihêlî.

ARGAN

Çima ez nikarim?

NOTÊR

Huqûqê Adetî* dest nade. Ger hûn li welatekî ku huqûqa nivîskî lê derbas bibûya bûna, dibû; lê li Parisê û li bajarên din ên ku huqûqa adetî lê xwedî desthilat e, bikêmanî li piraniya wan ev yek nabe, him tişteki wiha hebe jî bêhukm e. Hemî tiştên ku jin û mêrên li hev mahrkirî karibin ji bo hev bikin, ew e ku bexşaneke wan hebe dema li jiyane bin bidin hevdu; ji bo wê jî divê gava ku ji her duyan yek bimire zarokên wan ne ji hev û ne jî ji kesekî din hebin.

ARGAN

Ev çi Adetêke bêperwa ye, ku rênade mêr karibe tişteki ji jineke ku

* Wê demê li Paris û gellek bajarên din ên bakurê Fransayê ev huqûq derbas dibû; huqûqa nivîskî ya Romayê bitenê li başûrê Fransayê derbas dibû.

pir jê hezdike û ewqas lê miqate ye re bihêle. Ji bo ku ez zanibim bê ez ê karibim çî bikim, divê ez bi parêzerê xwe jî bişêwirim.

NOTÊR

Ji bo tiştên wiha qet navê ku mirov biçe cem parêzermarêzeran, ji ber ku ew him di warê qanûn û nîzaman de pir dijwar in, him jî gava ku tu hema xetê şaş bikî ew dibêjin qey te sucekî pir mezin kiriye. Ji mirov re ji astengan pê ve dernaxin û qet nizanin wi-janê mirov jî rihet bikin. Kesên hîn munasibtir û têgihîştîtir hene ku divê berî mirov bi wan bişêwir e, ew çareya ku mirov hêdîka di ser qanûnê re biqevize û tiştê qedexe weke neqedexe nîşan bi-de çêtir dizanin; ew dizanin ku divê mirov çawa dê karibe asten-gên li pêş karekî ji holê rake, çavê xwe ji hin tiştên din re bigre û xwe ji qanûna Adefî jî bihosteyî pak bike. Wiha nebûna, heta îro me dê xwelî li serê xwe û bavê xwe bikira? Divê mirov rîya hêsankirina tiştan zanibe; wiha nebûya meyê çî bikira, wê gavê min metelikek jî di pîş de eyê me nedida.

ARGAN

Weke ku jina min ji min re gotibû, Mîrza, bi rastî jî tu mirovekî pir jîr û durist î. De ka wê gavê ji kerema xwe re ji min re bibê-je, ez ê çawa karibim mal û milkê xwe ji wê re bihêlim û zaro-kên xwe jê bêpar bikim

NOTÊR

Tu yê çawa karibî bikî? Tu dikarî bêtî ku hayê kesî jê çêbibe destekî jidil ê jina xwe peyde bikî, li gor isûlê bi wesiyetnameya xwe hemî tiştê ku tu dikarî ji wî dostî re bihêlî û ew jî divê paşê hemiyî li wê vegeîne. Her wiha, bi awayekî ku bala kesî nekişîne, tu dikarî gelek senedan bidî hin kesên din, ew kes jî bi belgeyekê divê diyar bikin ku li ser navê jina te, ji bo xatirê wê ev sened ji te stendine û divê maf û perê van senedan dîsa bighê wê. Her wiha jî tu dikarî, di saxiya xwe de, perê hazir bijmêrî bidî destê wê yan jî senedên xwe yên heyî ku divê maf û perê wan bighê kesê ku sened pê re bin bidî wê.

BÉLINE

Tu Xwedê! Ebeden divê tu serê xwe bi tiştên wiha re neêşînî. Xwedê meke ku tişteke bi te bê, lawê min, ma ez ê çawa bixwazim bimînim li vê dinyê.

ARGAN

Şêrîna min!

BÉLINE

Erê, rohnîya çavê min, ku bextereşîyeke wiha were serê min û ez te wînda bikim...

ARGAN

Cana min, bermaliya min!

BÉLINE

Bila jîyan li min heram be, hema wê gavê ez qet ji xwe re nejmî çêtir e.

ARGAN

Evîna min!

BÉLINE

Û ez ê jî bidim ser şopa te, ji bo tu zanibî ku ez çendî ji te hez dikim û bêyî te nikarim bijîm.

ARGAN

Yara min, te dilê min perçeperçe kir. Hinekî bîhna xwe fireh bike, ez heyrana çavên te me.

NOTÊR

Niha ne wextê van hêşiran e, him hîn tişteke wiha jî nebûye.

BÉLINE

Ax! Mirza, tu yê ji ku zanibî ku mirov jidil û can ji mêrekî hezbike tişteke çawa ye.

ARGAN

Delala min, ger ez bimirim, kula ku dê di dilê min de bimîne bitenê ew e, ku zarokekî min jî ji te tune. Mîrza Purgonî ji min re gotibû ku, ji bo zarokek ji me re çêbibe tiştê ku ji destê wî bê dê bike.

NOTÊR

Mereq meke, hîn jî dikare çêbibe.

ARGAN

Xanim, weke ku Mîrzayî gotiye, divê em wesiyeta min çêkin; lê, dîsa jî weke tedbîr, ez dixwazim bîsthezâr frankên xwe yên zêrînî ku di bin textê kulîna me de ne bixwe bijmêrim kefa destê te û her wiha jî her du senedên min ên ku ji bo kesê pê re hatine nivîsîn ên ku yek li Mîrza Damonî û ya din jî li Mîrza Gêranteyî ye bidim te.

BÉLINE

Na, na, ez yekî ji wan jî naxwazim. Ha! Te got çend hezar frang di bin textê kulînê de hene?

ARGAN

Bist hezar frank, şêrîna min.

BÉLINE

Ez hêvî û ricayê ji te dikim, careke din ji min re bahsa malê dinyayê meke. Him! Te got her senedek çend hezar e?

ARGAN

Sened, Xanima min, yek çar hezar û ya din jî şeş hezar e.

BÉLINE

Hemî malê dinyayê jî bidin min, delalê ber dilê min, ma ez te tu carî pê didim.

NOTÊR

Tu dixwazî dest bi wesiyetê xwe bikî, ku em wesiyetnameya te çêkin?

ARGAN

Erê, mîrza; lê li jûra min a piçûk dê serê me rihettir be. Xanim rabe, min bigihîne wir ji kerema xwe re.

BÉLINE

Heydê em biçin, nazikê min ê piçûk.

Sehneya Heştan

(Angélique, Toinette)

TOINETTE

Ev e, li gel notêr derî li ser xwe girtin, deng hate guhê min bahsa wesiyetname meysetnameyekê dikirin. Dibêjin av radizê dijmin ranazê, jinbava te disa ji bo ku tiştêkî li dijî berjevendiyên te bike bavê te dahf dide.

ANGÉLIQUE

Mal û milkê dinyayê ne li ser guhekî min e, ji xwe re çawa dike bila bike, bitenê bila nexwaze li evîna dilê min hikum bike, ez tiştêkî din jê naxwazim. Tu dibînî, Toinette, ku çi dolaban digêrin da ku dilê min di bin piyê xwe vekin bipelçiqînin. Ez hêvî û ricayê ji te dikim, tu yê min di rewşeke wiha de bitenê nehêlî.

TOINETTE

Ez, te bitenê bihêlim? Hema wê gavê bila ez bimirim ji min re çêtir e. Jinbava te, heta dikare bila bixwaze min bikşîne aliyê xwe û ji bo berjevendiyên xwe bikarbîne, min tucarî serê xwe li ber dananiye û hergav min aliyê te girtiye. Tu ji min re bihêle ez dizanim ku ez ê çi bikim. Ji bo xatirê te çi ji destê min bê ez ê kêmaniyê neximê; lê ji bo ku ez karibim baştir alîkariya te bikim, ez ê li miqamekî din bixim, ji bo ku ez xîretkêşiya xwe ya ji bo bexteweriya te veşêrim jî, ez ê xwe bi bavê te û jinbava te şêrin bikim.

ANGÉLIQUE

Tu Xwedê, ez li ber piyên te bigerim, tu yê cewabekê bişînî ji Cléanteyî re û jê re bibêjî ku dixwazin min bidin yekî din.

TOINETTE

Di vê hînê de ji xeynî selexwer Polichinelleyî pê ve kesekî din ê ku ez karibim pê vî karî bidim kirin tune, dilê wî di min de he-

ye, ku ez jê re çend peyvên şêrîn bikim bes e û ku ez ji bo te nekim ez ê ji bo kê bikim. Îro êdî pir bûye dereng; lê sibê, beyanî zû, ez ê wî bişînim û wê gelekî kêfa wî...

BÉLINE

Toinette!

TOINETTE

Ji Angelikê re dibêje: Va ye gazî min dikin. Êvar baş. Qet merameke, tu vê yekê ji min zanibe.

DAWIYA PERDEYA YEKÊ

Perde diguhere û bajarekî nîşan dide.

PERDEYA DUDUYAN

*Sehneya Yekê**(Toinette, Cléante)*

TOINETTE

Cléanteyî nasnake û jê dipirse: Tu çi dixwazî, Mîrza?

CLÉANTE

Tu nizanî ku ez çi dixwazim?

TOINETTE

Wî, li min pepûkê, ev tu yî? Tu ji me re ji kû derketî! Tu hatî çî bikî di vê hînê de?

CLÉANTE

Ez hatim qedera xwe hîn bibim, bi Angéliqueya delalî re bipeyivîm, derd û kulên dilê wê fêr bibim û raya wê ya di derbarê vê zewaca bêyom de ku ji min re niha gotin zanibim.

TOINETTE

Baş e, lê kes nikare wiha bihêsanî bi Angéliqueyê re bipeyive divê bi awayekî nepenî bêyî ku hayê kesî jê çêbibe, him divê ji te re gotibin ku ew di bin çî çavdêriyeke teng û tahl de ye, ne kes dihêle ku derkeve der, ne jî dihêlin ku bi kesekî re bipeyive, bitenê ew jî ji ber mereq û ji bo xatirê pîra metikeke wê ya teat-rê destûr dabûn ku em bèn wê komediya ku bû sedema jihev-heskirina we; jixwe çî bû wê rojê bû, lê me ji kesî re bahsa vê yekê nekir.

CLÉANTE

Jixwe ez jî ne weke Cléanteyî û evîndarê wê, lê weke hevalê ma-

mosteyê wê yê muzîkê hatim. Ez ê bêjim, me li hev kir, ew nika-
ribû bihata, lê wî ez li şûna xwe şandim.

TOINETTE

Ev e bavê wê tê. Tu hinekî xwe bide aliyekî û ji min re bihêle ku
ez bêjim tu hatiya.

Sehneya Duduyan

(Argan, Toinette, Clèante)

ARGAN

Mîrza Purgonî ji min re got, beyaniya sibê li jûra xwe duwazdeh
caran here wî serî û were vî serî; lê min jibîra kir ku jê bipirsim
dê bi dirêjayî yan bi firehiya jûrê biçim û bêm.

TOINETTE

Mîrza, ev xort ...

ARGAN

Hêdî bipeyivê, qewad te mêjiyê min çeliqand, qey tu bîrnabiyê
ku divê mirov bi nexweşan rê bi dengê bilind nepeyive.

TOINETTE

Mîrza, min xwest ez bêjim ku ...

ARGAN

Min ji te re got, hêdî bipeyive.

TOINETTE

Mîrza... *Weke ku dipeyive dike.*

ARGAN

Çi ye?

TOINETTE

Ez dibêjim ku ... *Weke ku dipeyive dike.*

ARGAN

Tu çi dibêjî?

TOINETTE

Bi dengê bilind: Ez dibêjim ku ev xortik hatiye ku bi te re bipeyive.

ARGAN

Bila bê. *Toinette bi destan ji Cléanteyî re îşaret dike da ku derkeve pêş.*

CLÉANTE

Mîrza...

TOINETTE

Henekê xwe dike: Wiha bi dengê bilind mepeyive, dê mêjiyê Mîrzayî biçeliqe.

CLÉANTE

Mîrza, ez gelekî kêfxweş bûm ku min tu li piyan dîtî û xwiya ye siheta te jî baş e.

TOINETTE

Weke ku hêrs bûye dike: Çawa tu dibêjî "ku siheta wî baş e?" Tu şaş î Mîrza herdem nexweş e!

CLÉANTE

Min bihîst ku Mîrza baş bûye, û ez dibînim ku serçavê wî jî ne wek yê nexweşan e.

TOINETTE

Tu bi gotina ku serçavê wî ne wek yê nexweşan e dixwazî çi bibêjî? Halê Mîrzayî tune ye, û yên ku ji te re gotine baş e ji zikreşiya xwe wiha gotine. Ew tu carî neketibû rewşeke wiha xirab.

ARGAN

Xebera wê ye.

TOINETTE

Ew li ser xwe ye dimeşe, radikeve, weke herkesî dixwe û vedixwe; lê dîsa jî pir nexweş e, bêhal e.

ARGAN

Rast e.

CLÉANTE

Mîrza, bi rastî jî ez gelekî li ber te ketim. Mamosteyê muzîkê yê Banûya keça te ez şandim. Ji bo çend rojan diviya biçûna gundê xwe; weke dostekî xwe yê dilsoz, ji bo ku dersa wê nîvco nemîne û ji ber tîrsa ku navberî tekeve dersê dikare tiştê ku berê hîn bûye jibîr bike, wî ez li şûna xwe şandim.

ARGAN

Pir baş e. (dizivire ser Toinetteyê) Bangî Angéliqueyê bike.

TOINETTE

Ez bawer im, Mîrza, ku ez Mîrzayî bibim jûra wê dê batir be.

ARGAN

Na; tu wê bîne vir.

TOINETTE

Ku ne li ciyekî xewle bin, ew nikare weke ku divê dersa wê bi-diyê.

ARGAN

Belê dikare, dikare.

TOINETTE

Mîrza, ev yek dê ji te re ji sergêjiyê pê ve tiştêkî din nîne, him di rewşeke wek ya te de divê mirov xwe ji tiştê biheyecan biparêze, nexwe dê mêjiyê te biçeliqe.

ARGAN

Na, na tiştêk nabe. Ez ji muzîkê hez dikim, him belkî ez xwe baştir his bikim ku... Ah! Va ye hat. Tu biçe binêre bê, xanima min cilên xwe li xwe kirine.

Sehneya Sisiyan

(Argan, Angélique, Cléante)

ARGAN

Were, keça min. Mamosteyê te yê muzîkê çûye gund, û ji bo ku rê te bide ev e ev xort li şûna xwe şandiyê.

ANGÉLIQUE

Ax, Xwedê!

ARGAN

Çi bû? Çi ma tu wiha şaş mayî?

ANGÉLIQUE

Ev...

ARGAN

Çi bi te hat? Tu çima ewqas mat bûyî?

ANGÉLIQUE

Ewk, bavo, lihevrashtatîneke wiha min qet bawer nedikir.

ARGAN

Çawa yanî?

ANGÉLIQUE

Şeva din min di xewna xwe de dît ku ez di rewşeke pir xirab de bûm, û eyn mirovekî wek vî Mîrzayî derket hember min, min jê alîkarî xwest, û wî jî ez ji wê tengasiya ku ez tê de bûm derxist; şaş û matbûna min a bêpîvan ji ber wê ye ku, kesê min di xewna xwe de dît aniha bi rastî jî li hemberî min rawestiya ye.

CLÉANTE

Dixwazî bila tu di xewê de bî yan şiyar bî, tiştek ji bo min jê

xweştir tuneye ku tu min bînî bîra xwe, bi rastî jî ku tengiyeke te hebûya û te ez layîq bidiyama ku ez te ji wê tengiyê rizgar bikim, bawer bike ez ê gelekî bextewer bibûma; him tiştêkî ku ez nika-ribim ji bo te bikim tu...

Sehneya Çaran

(Toinette, Argan, Angèlique, Cléante)

TOINETTE

Henekên xwe dike: Bawer bike, Mîrza, êdî ez aliyê te me, û ji bo hemî tiştên ku min doh got ez pir poşman im. Ev e, Mîrza Diafoirusê bav, û Mîrzayê kurê wî hatine serekî bidin te. Pir baş e, xînamtiya we pîroz be, ji yekî bibe hezar maşalê! Tu yê bibînî lawik xortekî pir çeleng e, û ewqas jî bi heş e. Hîn ji du peyvan pê ve tiştêk negot, ez lê heyran û hişmetkar mam, û keça te jî dê bi ser wî de dîn bibe.

ARGAN

Ji Cléanteyê ku weke dixwaze biçe re dibêje: Tu qet bi derekê de naçî, Mîrza. Ez ê keça xwe bidim mêr; û xortê ku wê dixwaze hatiye, ku wê ew hîn qet nedîtiye.

CLÉANTE

Ji bo min rûmeteke pir mezin e, Mîrza, ku tu bixwazî ez jî bibim şahidê hevdişîneke ewqas xweş.

ARGAN

Lawik kurê doktorekî gelekî bikêrhatî ye, û heta çar rojên din em ê mahra wan bibirin.

CLÉANTE

Pir baş e.

ARGAN

Ji kerema xwe re xeberê bide mamosteyê wê yê muzîkê, balê bila dema dawetê amade be.

CLÉANTE

Ser ser û çavên min.

Tu jî kerem bike, were.

CLÉANTE

Tu min şermezar dikî.

TOINETTE

Heydê, divê em bikevin rêzê, ev e ew jî tên.

Sehneya Pêncan

(Mîrza Diafoirus, Thomas Diafoirus, Argan, Angélique, Cléante, Toinette)

ARGAN

Destê xwe dibe kûmê xwe yê ku qet ji serê xwe nake: Mîrza, Mîrza Purgonî li min qedexe kiriye ku ez kumê xwe ji serê xwe bikim. Tu jî hevkarê wî yî, niha tu jî zirara vê yekê dizanî.

MÎRZA DIAFOIRUS

Di hemî seredanên xwe de em dixwazin xwe bighînin hewara nexweşan, ne ku rihetiya wan xirab bikin.

ARGAN

Ez tê digihêm, Mîrza... Herdu jî di heman demê de diaxivin, peyva hev dibirin, û gotinên wan tevlihev dibin.

MÎRZA DIAFOIRUS

Em hatin vir, Mîrza...

ARGAN

Ez bi hatina we şad û bextewer...

MÎRZA DIAFOIRUS

Lawê min Thomas, û ez...

ARGAN

Rûmeta ku we da min...

MÎRZA DIAFOIRUS

Tu dibînî, Mîrza...

ARGAN

Him min jî hêvî dikir...

MÎRZA DIAFOIRUS

Bexteweriya me...

ARGAN

Min jî dixwest ku ez bihatama cem...

MÎRZA DIAFOIRUS

Qenciya ku tu bi me dikî...

ARGAN

Ji bo ku tu bawer bikî...

MÎRZA DIAFOIRUS

Ji dil dixwazî pêşwaziyê li me bikî ...

ARGAN

Lê tu jî dizanî, Mîrza...

MÎRZA DIAFOIRUS.

Bi şeref, Mîrza...

ARGAN

Nexweşekî belengaz ê wek min...

MÎRZA DIAFOIRUS

Mervantiya bi te re...

ARGAN

Ku tiştêkî din ji destê wî nayê...

MÎRZA DIAFOIRUS

Bi soz û peyman...

ARGAN

Dikare wekî din çî ji bo we bike...

MÎRZA DIAFOIRUS

Tiştê ku peyvendiya wî bi pîşeyê me hebe...

ARGAN

Tiştê ku ji destê wî bê dê kêmaniyê nexiyê...

MÎRZA DIAFOIRUS

Her wiha ji bo hertiştêkî din jî...

ARGAN

Ji vê pê ve dikare çî bibêje...

MÎRZA DIAFOIRUS

Em ê herdem amade bin, Mîrza...

ARGAN

Ew hergav di xizmeta we de ye...

MÎRZA DIAFOIRUS

Tu ji xwe re binêre bê mervatî çawa ye. (*Li lawê xwe vedigere û jê re dibêje.*) Heydê, Thomas, derkeve pêş. Tu jî peyva xwe bêje.

THOMAS DIAFOIRUS

Kurekî bejin rewtefî û tewteweyî ye, ku nû xwendina xwe temam kiriye û hertiştî bi awayekî çort û bêrê dike: Berî ku mirov ji bavê dest pê bike, lirê ye ne wiha?

MÎRZA DIAFOIRUS

Erê.

THOMAS DIAFOIRUS

Mîrza, ez hatim cenabê te weke bavê xwe yê duduyan qebul bikim, rêz û silavên xwe ji te re pêşkêş bikim; him jî bavekî wiha ku divê ez vekirî bibêjim ku ez ji bavê xwe bêtir deyndarê wî me. Bavê min bû sebebê ku ez bêm dinyayê; lê te ez ji xwe re weke law hilbijartim. Wî diviya ez qebûl bikirama; lê tu bi dilê xwe min qebûl dikî. Ez ji pişt a wî, berhemê bedena wî me; lê yê te, ez berê îrade û daxwaza te me; û çawa ku qudreta rûhanî di ser karebûna bedenê re ye, ez jî ewqas deyndarê te me, û ez jî ewqas rûmetê didim vê pêwendiya merivantiya pêşerojê, ji ber vê çendê ye ku ez îro ji niha ve hatim rêz û hîmetên xwe ji cenabê te re pêşkêş bikim.

TOINETTE

Bijîn zanîngeh, çi mirovên jîr û zane ji wan derdikevin hayê me ji wan tune ye!

THOMAS DIAFOIRUS

Min baş got, newiha bavo?

MÎRZA DIAFOIRUS

*Optime**

ARGAN

Ji Angéliqueyê re dibêje: Heydê, tu jî silavê bide Mîrzayî.

THOMAS DIAFOIRUS

Ez wê maçî bikim**, bavo?

MÎRZA DIAFOIRUS

Erê, erê.

THOMAS DIAFOIRUS

Ji Angéliqueyê re dibêje: Xanim, Xwedê serî dibîne kûm lê datî-

* Bi latîni mana xwe -pir baş- e.

** Dixwaze destê wê, dêmên wê yan lêvên wê maçî bike nediyar e. Lê xwiya ye, dê xwestibe wê ji lêvan maçî bike, ne ji ber ku dergistiyê wê ye, wê demê li Fransa gava ku mirov bi jinekê re bihatana naskirin, ji lêvan maçîkirin adet bû. Niha ji di dêman maçîkirin adet e. Montaigne jî, di pirtuka xwe ya sîsiyan, beşê pêncan de, giliyê ku bi sedema vê adetê, ji jinên ku xwe ji lêvên xwe didan maçîkirin dike.

ne beleheq sifetê xesûyê li te nekiriye, piştî ku...

ARGAN

Ya ku tu pê re dipeyivî ne jina min, keça min e.

THOMAS DIAFOIRUS

Ew li ku ye?

ARGAN

Ew dike bê.

THOMAS DIAFOIRUS

Bavo, ez li bendê bim heta ku bê?

MÎRZA DIAFOIRUS

Sipasî Banûyê bike, gotara ku te jê re hazir kiribû bêje.

THOMAS DIAFOIRUS

Banû, ne kê m ne zêde çawa ku peykerê Memnon*, bi rohnîkirina tîrêjên rojê re, dengekî biharmonî derdixe; her wîha ez jî bi dîtina tava bedewiya te heyecana vejînekê bi xwe re his dikim. Û weke xwezanas destnîşan dikin ku kulîlka binavê héliotropoyê bêrawestan ber bi tava rojê ve dizivire, dilê min jî dê ji îro pê ve her dem ber bi wan çavên te yên wek sitêrkan dibirûsînîn û mirov heyran dihêlin, ber bi wê qibleya bitenê ve bizivire. Ji kere ma xwe re izna min bide, Banû, ku îro ez vî dilê xwe yê ku he tabiheta, ji xeynî ku bixwaze ez weke mirovekî pir nefsbîçûk, pir hîrmetkar, xizmetkarekî pir sadiq û mêrê te bim pê ve tu armanc û miradê wî yê serketineke din tuneye, li ber piyên bedewiya te weke qurban bikim gorî.

TOINETTE

Ji aliyekî ve henekê xwe pê dike û ji aliyê din ve jî wiha dibêje:
Xwiyaye, fêda xwendinê jî ev e, mirov wiha hî nî peyvên xweş dibe.

* Peykerêkî, tevî ku yekî din ê wekî wî hatiye çêkirin jî hîn bilin e (18). Li Misrê li bajarê Thebeyê, li serê rîya ku diçe perestgeha Amenophisê III-yan, hatiye avakirin. Gava ku roj hiltê, kevirê wî yê germ dibe, dengekî muzîkayî derdixe. Li gor efsaneyê diya xwe ya ku Banûya berbangê ye silav dike.

ARGAN

Ji Cléanteyî re: Êê, tu ji vê yekê re dibêjî çi?

CLÉANTE

Ez dibêjim ku Mîrzayî gelekî xweş kir, û ku doktoriya wî jî weke zimanê wî xwirt be, yê ku bibe nexweşê wî dê xenê bibe.

TOINETTE

Helbet. Ger ku weke bi vî awayê xweşik dipeyive, wiha xweş tedawî jî bike mirov dê jê re heyran û hişmetkar be.

ARGAN

Heydê zû palkursiya min bînin, û ji herkesî re jî rûnitekekê bînin. *Xulam rûnitekan tînin*, tu li vir rûnê, keça min. *Ji mîrza Diafoirusî re dibêje*, Mîrza, tu dibîni ku herkes heyrana Mîrzayê kurê te ye, û ji bo ku lawekî te yê wiha heye birastî jî divê tu bextewer bî.

MÎRZA DIAFOIRUS

Mîrza ne ji ber ku ez bavê wî me, lê ez dikarim bêjim ku sedemên min ên ku ez jê razî bim hene, û herkesê gava ku wî dibîne jê weke kurekî ku qet tu xirabî jê nayê xeber dide. Bi rastî ne kesekî ku bîra wî kûr, ne jî weke hinekan fikir û hizrên wî tûj bûn; lê hîn gava ku zaro bû min tê derxist, ku karebûna wî ya ku tiştan bide ber hev û encaman jê derxe û ku ji bo pîşeyê me jî di-ve, heye. Dema ku piçûk bû, qet ne weka wan zarokên ku mirov ji wan re dibêje mizawir û şiyar bû. Herdem hêmin, di halê xwe de, bêdeng, tucarî peyv ji devê wî dervediket û tucaran bi wan lîskên piçûk ên ku mirov ji wan re dibêje lîskên zaroktiyê nedilist. Heta ku me ew hînî xwendinê kir kezeba me reş bû, û heta ku bû neh salî jî hîn xweşikî herf ji hev dervedixistin. "Min ji xwe re got, baş e, darên ku dereng mezin dibin ên ku ber û meyweyên wan herf xweş in; kolana hestemî ji ya qûmê gelekî zortir e; lê tiştê ku li ser tê kolan jî ewqas zor jê diçe; û ew hêdîbûna têgihîştinê, ew giraniya hizirînê nîşana mihakemeyeke baş a pêşerojê ye." Gava ku min ew şand fakulteyê, pir pê giran hat; lê li hemberî zoriyê diberxwe da, mamosteyên wî tim ji min re pesnê xebatkarî û sebatkariya wî didan. Di encamê de, weke ku

tu bi derziyê bîrê bikolî, bi awayekî serketî xwendina xwe tamam kir û şahadetnameya lîsansê girt; him bêyî ku ez xwe pê mezin bikim, ez dikarim bêjim ku di van herdu salên* ku sitaja xwe dikir de, di hemî mînaqêşeyên Xwendîngeha me de, nûnerekî weke wî ku karibe balê bikşîne ser xwe û deng bide derneket. Êdî gîhaştibû wê radeyê ku herkesî jê dipelikan, hete bigihê berevajîya rastiye, di her mînaqêşeyê de tu mijara ku wî nikaribûya heta dawiyê biparazta û îsbat bikira tunebû. Di mînaqêşê de pir hişk e, di bazarê de jî weke Tirkekî "Dibêje Nûh, nabêje pêxember", ji ser yek û duduya xwe danakeve û dehyeka xwe heta quncika dawîn a mentiq didomîne. Lê di ser hemî tiştî re, xwiya wî ya bi min xweş ew e, ku min ji xwe re dike rêber û çavgirtî li dîtinên pêşiyên me xwedî derdikeve. Hergîz ne xwestiye guhdariya teorî û tecrûbeyên gera xwînê ku xwedêgiravî îcada sedsala me ye û dîtinên din ên bi vî rengi bike û ne jî têbigihê.

THOMAS DIAFOIRUS

Tezeke mezin a rûlokîrî ji berîka xwe derdixe, ku pêşkêşî Angéliqueyê bike: Min li hemberî parêzerên gera xwînê têzek paraztibû, ku bi destura mîrziyê be, ji bo silav û rêzê, ez ê karibim wê weke berê pêşî, yê mêtîyê xwe pêşkêşî Banûyê bikim.

ANGÉLIQUE

Mîrza, ev dê ji min re bibe barekî vala û ez ji mijarên wiha jî tiştekî tênahihêm.

TOINETTE

Bide, bide, nexş û nemûşên wê ji bo xeml û xêzê baş in; em ê pê jûra xwe bixemilînin.

THOMAS DIAFOIRUS

Disa bi destûra Mîrziyê be, ez te dawet dikim were rojekê ji van rojan ji bo ku tu bayekî ji ber serê xwe berdî, kişfa termê jinekê bibîne, ku divê ez li ser bîr û hizrên xwe diyar bikim.

* Wê demê xwendina bijlkiyê piştî bekelorya (lîse) du sal lîsans bûn. Lîsans jî wê demê ji beşdarbûna mînaqêşeyên vekirî pêk dihat

TOINETTE

Fatê wer dawetê, çi ji vê xweştir heye. Me kesên ku hezkiriyên xwe dibin komediyan bihîstibûn; lê xwiya ye şerha miriyan ji bo xortê malê hîn tiştêkî mestir e.

MÎRZA DIAFOIRUS

Jixwe, wekî din ji aliyê taybetmendiyên ji bo mahrê û ziryetê, baweriya te ji Xwedê be, li gor rê û rêzikên ku bijîşkên me tesbît kirine, tu tayê wî nabinî, ji alî karebûna berdewamiya neslê xwe ve hêjayê pesindanê ye û xwedî tenduristiyeke ku kare zarokên noşdar bîne dinyê ye.

ARGAN

Mîrza, niyeta te ku tu lawê xwe bixî serayê û li wê derê jê re karêkî bijîşkiyê bibînî tuneye gelo?

MÎRZA DIAFOIRUS

Tu rastiye bixwazî, pêkanîna pîşeyê me li cem mezinan hergîz bi min xweş xwiya nebûye, û ez hertim dibêjim ku ji bo me hekîman xizmeta xelkê ji hertiştî çêtir e. Mirov dikare rihet bi xelkê re derxe serî. Tu ne mecbûrî hesab bidî tu kesî; helbet usûl û qaîdeyên hunerê me çi îcab bike divê tu wê pêk bînî, ji bo tiştê ku paşê bibe qet tu ne mecbûrî serê xwe biêşînî. Lê li ba mezinan tiştê ku mirov aciz dike, ew e ku, gava nexweş dikevin, miheqeq dixwazin ku bijîşk wan sax bike.

TOINETTE

Tu henekê xwe dikî, bi rastî jî tiştêkî wiha bêperdaxî ye ku dixwazin hûn wan rihet bikin nexwe hûn ji bo vê yekê li cem wan in; hûn bitenê ji bo mehaneya xwe bistînin û ji wan re dermanan binivîsin li nik wan in; divê ew rihet bibin ger ku karibin.

MÎRZA DIAFOIRUS

Rast e, xebera te ye. Ji xeynî ku li gor usûlê em li wan binêrin û ji wan re dermanan binivîsin tu mecburiyeteke me ya din tuneye.

ARGAN

Ji Cléanteyî re dibêje: Mîrza, bi keça min sitranekê ji mêvanê me re bide gotin.

CLÉANTE

Ji xwe ez jî li benda emrê te bûm, mîrza, û ji bo mêvanan kêfxweş bikim, min jî xwestibû ku ez li gel banûyê em sehneyeke piçûk ji opera ku me bistika din amade kiribû pêşkêş bikin. Bigre, ev e beşê ku divê tu bixwînî.

ANGÉLIQUE

Ez bixwînîm?

CLÉANTE

Ji kerema xwe re, nebêje ku ez nizanîm û ji min re bihêle ku ez nîşanî te bidim bê sehna ku divê em bistirênin çî ye. Dengê min dernakeve ku ez bistrênîm; lê li vir ku hema ez karibim xwe bidim bihîztin bes e, û ji ber ku divê ez vê sitranê bi Banûyê bidim xwendin li min bibûre.

ARGAN

Ristên wê xweş in nexwe?

CLÉANTE

Tu rastiye bixwazî tenê operayeke piçûk ku divê mirov bavêje berhev û ji bo wê jî tiştê ku hûn ê guhdarî bikin ji pexşana bi-aheng, an ji ristên serbest ku eşq û mecbûriyet dikare bi du mirovan re peyde bike û bide gotin û ku ji dilê wan tê pê ve ne tiştekî din e.

ARGAN

Pir baş e. De ka em guhdarî bikin.

CLÉANTE

Ji devê şivanekî, gava cara ewilî rastî hezkiriya xwe tê jê re dilê xwe vedike, û paşê meramê dilê xwe bi sitran ji hev re dibêjin. Ev e mijara vê sehnê. Şivanekî ku bala xwe baş daye bedewiya sehneya liskekê, ku nû dest pê kiriye, bi hengameyeke ku li dorra wî peyde dibe li xwe hay dibe. Li xwe dizivire, û zirtebozekî, ku bi peyvên nexweş heqaretê li keçeke şivan dike dibîne. Pêşî di dilê xwe de dibêje divê her mêr rêz û hirmeta jinan bigre; ra-

dibe bi hewara keçikê ve diçe, piştî ku heqê bêedebiya mêrikê zirteboz didiyê, vedigere cem keçikê, çi bibîne keçeke ciwan ku, ji herdu çavên wê yên xezalî ku di emrê xwe de tiştê wiha nediye, hêsirên herî xweşik yên vê dinyayê wek ba û baranê li bin guhê hev dikevin. "Gunekê! Di dilê xwe de dibêje, mirov çawa dikare heqaretê li keseke wiha şêrîn bike? Û dilê kîjan nemerdi, kîjan hovî dikare bi van hêsirên wiha bêguneh neêşe?" Di ber dilê wê dide, ku keçik wan hêsirên xwe yên ku bi wî ewqas xweşik in bişemirîne; û şivana xweşdivî jî di eynî wextê de han dide ku ji bo vê alîkaniya wî ya sivik sipasiya wî bike, lê bi henûniyeyeke ewqas ji dil, ewqas milayîm û şêrîn sipasiya wî dike ku şivan nikare xwe li hemberî wê ragire; her peyvek, her awirek, dibe tîreke ji alavên êgir û di nav dilê wî de diçin xwar. Ji xwe re dibêje, gelo tiştêkî ku karibe hêjayî wan peyvên şêrîn ên sipasiyeyeke wiha be, hebû? Û mirov dikare çi neke, ji ber çi debar neke, xwe li kîjan xeterê neqelibîne, ji bo ku mirov ji bo bîstekê jî be bala rihekî ewqas hesas û ewqas qedr û qîmet dizne bikîşîne ser xwe?" Bêyî ku tiştêk bala wî bikîşîne hemî lîsk derbas dibe diçe; lê liberdikeve ku pir kin bû, ji ber ku gava bidawî bê, dê wî ji şivana wî ya nazenîn bidûr bixe; û ji vê hevdiîna pêşî, ji vê dema lihev rasthatina cara ewil, li vegeerê heyecana herî bihêz a ku evîneke bisalan ajotibe dikare bi mirov re çêke bixwe re tîne mal. Ev e ji naha ve hemî êşa ji hev bidûrketinê di dilê xwe de his dike, û tasewasa careke din nedîtina wê kesa ku ewqas hindik dîtibû pê digre. Ji bo careke din wê xeyala şêrîn ku bi şev û bi roj ji heşê wî nedîçû bibîne tiştê ku ji destê wî tê dike; lê dijwariya mezin zebtûrehta li ser şivana wî hemî rê û dirban li ber wî digre. Bi evîneke wiha pê ve hatiye girêdan ku, dizane nikare bêyî wê bijî, biryara zewaca bi wê karaxezala re dide, bi nameyeyeke ku bi awayekî digihîniyê destûra wê jî digre. Lê di eynî wextê de dibihîze ku bavê wê delalê biryara ku wê bi yekî din re bizewicîne daye, û ji bo daweta wê, mahra wê her tişt amade ye. Êdî kul û kedera dilê şivanî hûn hesab bikin. Ev e êş û janeke ku mirov bê derb dike. Nikare ji ber wê fikra dijwar a ku xweşdiviya xwe di himêza kesekî din de bibîne debar bike; û evîna wî ya bêhêvî rîya ku

wî bibe mala şivana wî bi ber dixê, da ku hisên wê hîn bibe û ji devê wê qedera ku li benda wan e bibihîze. Li wir hemî tiştê ku jê bi tirs e tê serê wî; li wir hevrikê xwe yê teres ê ku inyata bavê keçikê ji bo wan xeyalên wê yên şêrîn xera bike derdixê pêşberî wê dibîne. Hevrikê xwe yê ku kenê gura pê tê, li teniştê şivana xweşdivî dibîne ku çawa xwe qure dike, weke ku kele fete kiribe; lê ev dîmen wî ewqas hêrs dike, ku bizorê xwe digre. Bi awirên xemgîn li cangoriya xwe dinêre; rêz û hirmeta wê, û amadebûna bavê wê rê li ber digire ku tiştêkî jê re bêje, bitenê bi awirên çavan dikare xeber bide. Lê di encamê de zorê dide hemî astengan, û besta evîna wî zorê didiyê wî dipeyivîne wiha dike gazî (*distirêne*):

*Delalê Philis, êdî bes e, bes e ev êş û azar;
Êdî bes e ev bêdengiya kambax, dilê xwe ji min re veke.
Qedera min, aqûbeta min ji min re bêje:
Divê ez bijîm, an ez bimrim?*

ANGÉLIQUE

*Lê vedigerîne bi sitran dibêje:
Tu halê min dibînî, Tircis, xemgîn û sermest im
Ji ber van haziriyên dawetê ku tu jî dibînî
Min berê xwe daye ezmên, ez li te dinêrim, axîn dikêşim,
Ez dikarim çi ji te re bibêjim xwedê hebînî.*

ARGAN

Wey! Min bawer nedikir ku keça min, wiha bi serbestî weke ku ji pirtûka vekirî notayan bixwîne karibe bistirîne.

CLÉANTE

*Ax! Delalê Philis,
Gelo dikare evîndar Tircis*

*Weke herkesî bextewar be
Di dilê te de ciyek jê re jî hebe?*

ANGÉLIQUE

*Ez nema karim ji ber vê êşa dijwar debar bikim
Erê, Tircis, ez ji te hez dikim.*

CLÉANTE

*Ev çi peyvên xweş in, çi zarê şêrîn!
Nexwe ez şaş tê negîham!
Careke din bibêje, Philis, ku ez jê nekevim şikê.*

ANGÉLIQUE

Sed carî erê, Tircis, ez ji te hez dikim.

CLÉANTE

Carke din, dîsa, bibêje

ANGÉLIQUE

Ez ji te hez dikim.

CLÉANTE

Sed carî bêje, bêzar mebe.

ANGÉLIQUE

*Ez ji te hez dikim, ez ji te hez dikim,
Belê, Tircis, ez ji te hez dikim.*

CLÉANTE

*Xwedano, qiralno, ku dinya berdestê we ye binêrin,
Ez bextewer im, hûn bextewer in?
Lê, Philis, tişteke heye
Kêf û şadiya min şêlî dike:
Hevrikê min, ev kebede...*

ANGÉLIQUE

Ax! Weke mirina min li pêş çavên min be;

*Hebûna wî weke te min jî ji eyar derdixe,
Weke ez bê gorê emana min dibe.*

CLÉANTE

Lê sed heyf û mixabin bavê te dixwaze te bide wî

ANGÉLIQUE

*Bila ez bimrim, ji axa sar re bim,
Ji dêvla ku ez wî bikim;
Bila ez bimrim, nemînim li darê vê dinyayê.*

ARGAN

Baş e, bav çi dibêje ji vê yekê re?

CLÉANTE

Tiştêkî nabêje.

ARGAN

Ev çawa bav e, vê rezaletê bi çavên serê xwe dibîne hîn jî dengê xwe nake.

CLÉANTE

Ax! Xweşdiviya min...

ARGAN

Na, na, êdî bes e. Ev komediya han dê bibe minakeke pir xirab. Tircisê şivan bêedebekî dera han e, û Philisa şivan jî ku li pêş bavê xwe wiha dipeyive rûşûştîyek e ku rûyê wê ji kesî naêşe. Ka wê kaxezê nişanî min bide. Hela, hela. Kanî ew hemî peyvên ku we gotin? Li vir ji notayên muzîkê pê ve tiştêkî din tune ye?

CLÉANTE

Ma tu nizanî, Mîrza, ku ev serê çendakî ye usûla bi notayan peyv xwendinê hatiye peydekirin?

ARGAN

Ya pir baş e. Tu bi ser çavên xalê xwe re hatî, Mîrza; heta careke din em hev bibînin, oxir be. Me ev opera te ya nelirê nedîta dê baştir bûya.

CLÉANTE

Min xwest ez hinekî kêfa we bînim.

ARGAN

Tiştên nelirê qet kêfa mirov nînin. Ah! Wa ye jina min.

Sehneya Şeşan

(Mîrza Diafoirus, Thomas Diafoirus, Argan, Angèlique, Clèante, Toinette, Bèline)

ARGAN

Cana min, ev e lawê Mîrza Diafoirusî.

THOMAS DIAFOIRUS

Dest bi xwendina gotareke pesindanê dike, lê bi carekê re tiştê jiber kiriye jibîra dike, nikare dom bike: Xanim, beleheq negotine Xwedê serî dibîne kum lê datîne, ji bo wê xesûtî layiqî te dîtiye, lewra mirov di riwê te de...

BÉLINE

Mîrza, ez tam di wextê wê de hatime û ez bi dîtina te gelekî kêfxweş bûm.

THOMAS DIAFOIRUS

Lewra mirov di riwê te de... lewra mirov di riwê te de... Xanim, te tam di ortê de peyva min birî, û hişê min bela kir, dawiya tiştê ku min ê bigota nema tê bîra min.

MÎRZA DIAFOIRUS

Thomas, tiştê ku te yê bigota bila bimîne careke din.

ARGAN

Min dixwest ku tu hinekî din zûtir bihata, cama min.

TOINETTE

Ax! Xanim, tu nizanî ku tu negîhaştî ser çî, ne ser bavê duduyan; ne peykerê Memnon, ne jî kulîlka bi navê heliotropeyê.

ARGAN

Heydê, keça min, destê xwe bide Mîrzayî, û sond bixwe, ku tu wî ji xwe re bi mêmîti qebûl dikî.

ANGÉLIQUE

Wî bavo.

ARGAN

Hela, hela! "Bavo" çî bû? Tu dixwazî çî bibêjî?

ANGÉLIQUE

Ez hêvî û ricayê ji te dikim, tiştên wiha nayên ecelê. Qet nebe derfeta ku em hev nas bikin bide me, û ji bo avakirina girêdaneke malbatî ya rêkûpêk divê em hinekî li hev germ bibin û bibanin.

THOMAS DIAFOIRUS

Tu ji min bipirsî, Banû, hemî hisên ku tu dibêjî ji zû de bi min re çê bûne û min navê ku ez hîn zêdetir xwe ragirim.

ANGÉLIQUE

Herçend tu ewqas ecele bikî jî, Mîrza, min navê ez wek te bikim, him ku tu rastiyê bixwazî meziyetên te jî hîn tu tesîr li min nekirine.

ARGAN

Ho, ho tu ji xwe re lê binêrin! Tiştê ku tu dibêjî gava ku hûn zewicîn dê hêdî hêdî jiberxwe bibe.

ANGÉLIQUE

Wî! Bavo, ez ricayê ji te dikim hinekî mohletê bide min. Zewac zincîreke wiha ye ku hergîz divê mirov dilekî bi zorê pê ve girê-nede; him ku Mîrza mêmekî çê be, divê qet keseke ku di bin darê zorê de mecbûrî wî bûbe qebûl neke.

THOMAS DIAFOIRUS

*Nego consequentiam**, Banû, him ez dikarim mêmekî çê bim, him piştî ku bavê te te dide, te qebûl jî bikim.

ANGÉLIQUE

Riyeke wiha hilibjartin helwesteke pir xirab e, hezkirin bi darê zo-rê nabe.

THOMAS DIAFOIRUS

Em ji tiştên dixwînin hîn dibin, Banû, mirovên berê keçên ku dê bi wan re bizewiciyana bitorê ji malên bavên wan direvandin da ku kesek nebêje bi dilê xwe xwe davêjin himbêza mêran.

ANGÉLIQUE

Berê, Mîrza, çû bi berê, him em ne mirovên berê ne. Di wexta me de ne hewce ye ku mirov dekan bike; û gava ku zewac bi dilê me be, bêyî ku hinek me li pey xwe bikişînin em baş dizanin ku em ê çawa biçin. Hinekî sebir bike. Ger tu ji min hez dikî, Mîrza, hemî tiştê ku ez dixwazim divê tu jî bixwazî.

THOMAS DIAFOIRUS

Erê, Banû, heta radeya ku daxwazên te ne li dijî berjevendiyên evîna min bin.

ANGÉLIQUE

Lê îsbata mezin a evînê, pêkanîna her daxwazeka kesa ku mirov jê hezdike ye.

THOMAS DIAFOIRUS

*Distingo, Banû di rewşa ku têkilî milkiyeta wî nebe de, ku têkil bibe, nego.***

TOINETTE

Ji Angéliqueyê re dibêje. Tu beleheq berbayî gotinên wî ketiyî. Mîrzayê piçûk fakulte nû qedandiye, tu çiqasî singekî bikutî ew dê turekî pê dabike û nehêle tu bipeyivî. Tu çi berxwedanê dikî, çima tu jî xwe nadî xwendinê û serketina fakultê qebûl nakî?

* Ez encamê red dikim. Formul ji minaqeşeyên li dibistanê, ku bi latînî dibin tê, Thomas Diafoirus bi vî awayî dixwaze ferqa xwe nîşan bide.

** Distingo Ez ferq dikim; concedo ez qebûl dikim; nego ez red dikim peyvên • minaqeşê • wek di rûpelê li jor de.

BÉLINE

Belkî dilê wê bi ser hinekî din de ye.

ANGÉLIQUE

Ku tiştêkî wiha hebûya, Xanim, xeman mexwe dê pir bi biaqilî û bi rûmet bibûya.

ARGAN

Hê yawel! Ez li vir li ber çî me, hûn ji min re nabêjin.

BÉLINE

Ku ez li şûna te bûma, lawê min, min qet zor nedidayê ku bize-wice, min dizanibû ku min ê çî bikira jê.

ANGÉLIQUE

Ez dizanim, Xanim, ku tu dixwazî çî bibêjî, û qenciya ku tu ji bo min difikirî jî; lê şîretên te jî, ji ber ku dê kesî şad û bextewar nekin dibe ku kesek wan cîbicî neke.

BÉLINE

Erê, êdî ji bo keçên wek te kemlan, giran û birûmet, ku nizanin rêz û hîrmet çî ye, li dijî riza bavê xwe derketin, bûye adet. Berê tiştên wiha tunebûn.

ANGÉLIQUE

Berpirsiyariya keçekê jî heta radeyekê, Xanim, aqil jî qanûn jî her tiştî li ser mirov ferz nake.

BÉLINE

Mana nexwe tu ne li dijî zewacê yî ; lê tu dixwazî mêrekî li gor dilê xwe bikî.

ANGÉLIQUE

Ger bavê min nexwaze min bide mêrekî bi dilê min, ez hêvî û ricayê jê dikim, qet nebe, bila ji bo ku ez bi yekî ku nikaribim jê hez bikim re bizewicim jî, zorê nede min.

ARGAN

Gelî Mîrzayan, ji ber vê minaqeşeya nelirê li min biborin.

ANGÉLIQUE

Her kes armanceke wî/wê heye gava ku dizewice. Ji bo min, mêrê ku ez wî mahr bikim divê ez bi rastî jî jê hez bikim, û karibim hemî jiyana xwe bispêrim wî, ku hûn rastiyê bixwazin ji ber wê ez dixwazim bi tedbîr bim. Hin jî hene, ji bo ku ji dê û bavên xwe xelas bin dizewicin, da ku hemî tiştên dixwazin karibin bi kêfa dilê xwe bikin. Hin kes jî hene, Xanim, ji bo berjevendiyan xwe yên şexsî zewacê wek bazirganiyê dibînin, bi tenê ji bo bibin xwediyê bermayên wan mêran dikin, da ku piştî mirina mêrên dikin zengîn bibin, û ji bo bibin xwediyê mîratê wan bi awayekî rûşûştî ji cem mêrekî bazdidin cem yekî din. Ev kesên wiha, tu rastiyê bixwazî, nadin pêş û paş, li kesên mahr dikin jî nanêrin baş.

BÉLINE

Ez dibînim ku îro zimanê te pir dirêj bûye, tu dixwazî bi van peyvan çî bibêjî derxe ya bin zimanê xwe.

ANGÉLIQUE

Ez, Xanim, ji tiştê ku min gotiye pê ve ez dikarim çî yê din bibêjim?

BÉLINE

Tu ewqas çortî, xweşikê, ku êdî mirov nikare tehemula te bike.

ANGÉLIQUE

Xanim, tu bi zorê min mecbûr dikî ku ez bersiva gotinên te bidim; lê ez ji te re ji niha ve dibêjim ku ez ê fersendeke wiha nedim te.

BÉLINE

Ji bêterbiyeta te re gotin tune.

ANGÉLIQUE

Na, Xanim, tu çî dibêjî bêje.

BÉLINE

Tu xwe mexrûr dikî lê tu dibî pêkenî, bêşerm û bêfedî tu xwe mezin dikî, lê hayê te ji te tune ku dinya alem bi te dikene.

ANGÉLIQUE

Tu çî jî bikî, Xanim, dê bi kêrî tiştêkî neyê. Di ser qehrê te re ez

ê terbiya xwe xera nekim; û ji bo ku ez hêviya ku tu bighêjî miradê xwe jî ji navê rakim ez ê ji pêş çavên te jî herim.

ARGAN

Guhdarî bike, pêş û paşê vê yekê tune di nav çar rojan de, yan tu yê bi Mîrzayî re bizewicî, yan jî ez ê te bidim ber dêrekê. *Di zîvire ser jîna xwe.* Tu ji xwe re meke derd, tu yê bibînî ku ez wê çawa tînim rê.

BÉLINE

Ji ber ku ez ê te bitenê bihêlim ez xemgîn im, lawê min, lê li nav bajêr karekî min heye, ku dive miheqeq ez hal bikim. Ez ê zû vegerim.

ARGAN

Here, cana min, û riya xwe bi notêrê xwe jî bixe, bila wan tiştên ku tu zanî hazir bike bişîne.

BÉLINE

Bi xatirê te, dostê min.

ARGAN

Oxir be, nhê min. Ev e jineke ku ji min hez dike... mirov ji vê yekê bawer nake.

MÎRZA DIAFOIRUS

Em jî diçin, Mîrza, bi îzna te be.

ARGAN

Ji kerema xwe re, Mîrza, tu dikarî li min binêrî bê ez çawa me.

MÎRZA DIAFOIRUS

Li rehjena wî dinêre: Heydê, Thomas, tu ji destê Mîrzayî yê din bigre, bê tu dikarî di derbarê rehjena wî de biryareke baş bidî. *Quid dicitis?**

THOMAS DIAFOIRUS

*Dico*** ku rehjena Mîrzayî êdî qet ne wek ya mirovekî normal e.

MÎRZA DIAFOIRUS

Baş e.

* Tu çî dibêjî ?

** Ez dibêjim.

THOMAS DIAFOIRUS

Ji bo ku mirov nebêje sert e, mirov dikare bêje hinekî sert davêje.

MÎRZA DIAFOIRUS

Pir baş e.

THOMAS DIAFOIRUS

Bi şûn de dahf dide.

MÎRZA DIAFOIRUS

Bene*

THOMAS DIAFOIRUS

Weke ku dike raweste dibe, paşê dîsa zûka zûka lêdide.

MÎRZA DIAFOIRUS

*Optime***

THOMAS DIAFOIRUS

Ev jî *parenchyme splénique****, ango di faterêşkê de nîşana nexweşiyekê ye.

MÎRZA DIAFOIRUS

Pir baş e.

ARGAN

Na; Mîrza Purgonî got ku kezeba min ne sax e.

MÎRZA DIAFOIRUS

Eh, ew jî rast tê hisêb ku mirov dibêje *parenchyme*, te mana wê jî û ya din jî, ji ber têkiliya wan ji nêzik ve bi kuna jêr a made, mûrehk û gelek caran bi riyên ziravî re jî hene. Bêgûman niha hertim goştê biraştî dide te.

ARGAN

Na, ji goştê kelandî pê ve tiştêkî nade min.

* Baş e.

** Pirr baş e.

*** Tevnîka faterêşkê.

MÎRZA DIAFOIRUS

Eh! Ha biraştî, ha kelandî hemî jî yek in. Pir bitedbîr xwiya ye tu rastiyê bixwazî, tu doktorekî ji wî çêtir jî nabînî.

ARGAN

Mîrza, gelo divê mirov çend tene xwê têxe hêkekê?

MÎRZA DIAFOIRUS

Şeş, heşt, deh, bi jimarên cot; weke ku ji bo dermanan jimarên fer divên.

ARGAN

Oxir be heta careke din, Mîrza. Piraniya hekîmên berê ji bo tiştên ku bixista xwarinê bi jimarên cot, tiştên ku tevlî dermanan jî bikira bi jimarên fer tesbît dikirin.

Sehneya Heftan

(Bêline, Argan)

BÉLINE

Ez vegeyam, lawê min, beriya ku ez derkevîm derve, min xwest ez ji te re tiştêkî bibêjim ku divê hayê te jê hebe. Ez di ber deriyê jûra Anguéliqueyê re derbas dibûm, min xortek li balê dît, ku lawik çav li min ket reviya çû.

ARGAN

Te xortek li cem keça min dît?

BÉLINE

Erê, keça te ya piçûk Louison jî li nik wan bû, tu dikarî jê jî bipirsî ew ê ji te re bibêje bê mesele çi bû.

ARGAN

Tu wê ji min re bişîne vir, hurme, bila nesekine bê. Ax qewada heram! Min êdî fêm kir bê ew berxwedan hemî ji bo çi dikir.

Sehneya Heştan

(Louison, Argan)

LOUISON

Tu çi dibêjî, bavo? Jinbava min got ku tu gazî min dikî.

ARGAN

Erê, were vir, biqedime. Berê xwe bide min, serê xwe rake, li min binêre. Êê!

LOUISON

Êê û çi bavo?

ARGAN

Ka bêje.

LOUISON

Ez çi bêjim.

ARGAN

Tiştêkî ku tu ji min re bibêjî tune?

LOUISON

Ger tu bixwazî ku ez bîhna te fireh bikim, ez ê ji te re çîroka *Çermê kerê*, yan jî mesela *Rovî û qirakê*, ku ez nû hîn bûme bibêjim.

ARGAN

Ez çîrokan ji te naxwazim.

LOUISON

Wê çaxê tu çi dixwazî?

ARGAN

Min ji te re negotibû ku te çi dît beriya hertiştî were ji min re bibêje?

LOUISON

Belê, bavo.

ARGAN

Ka te got?

LOUISON

Erê, bavo. Hemî tiştê ku min dît, ez hatim min ji te re jî got.

ARGAN

Baş e, te îro tiştêk necît?

LOUISON

Na, bavo.

ARGAN

Na?

LOUISON

Na, bavo.

ARGAN

Tu baş dizanî ku tiştêkî tu ji min re bibêjî tuneye?

LOUISON

Erê, ez baş dizanim.

ARGAN

Hema wiha! Hela tu xwe ji min re li vir ragire, ez ê niha tiştêkî rê te bidim.

Diçe radihêle qevda şiveke ter.

LOUISON

Ax! Bavo.

ARGAN

Tu yê bibêjî ax! Qewada heram, tu ji min re nabêjî ku te mêrek di jûra xweha xwe de dîtîye ne?

LOUISON

Ay bavo!

ARGAN

Ez ê niha derewan rê te bidim.

LOUISON

Xwe davêje ber piyên wî: Uy! bavo li min bibore. Eta min ji min re got ku divê ez ji te re nebêjim; lê ez ê niha hemiyî ji te re bibêjim.

ARGAN

Berî ji bo ku tu careke din derewan nekî divê tu çend şivotên wiha baş bixwî. Paşê em ê binêrin bê tu rast dibêji yan na.

LOUISON

Li min bibore, bavo! Ez careke din tiştêkî wiha nakim.

ARGAN

Na, na.

LOUISON

Ez biqurbana bavê xwe me, tu yê li min mexî.

ARGAN

Ez ê mirina te bînim.

LOUISON

Ji bonî Xwedê! Bavo, li min mexe.

ARGAN

Wê digre ji bo lê bixe: Çend çoyên wiha baş bixwe ku hişê te bê serê te.

LOUISON

Ax! Bavo, te birîn di canê min de vekir. Wiha meke, hayho ez mirim. (*Xwe li mirîti datîne.*)

ARGAN

Hela, hela! Ev çi bû? Louison, Louison. Ax, Xwedêwo! Louison. Heywax! Keça min çû! Haho! Li min bextereşî, bexrika min mir. Ez belengazê Xwedê ez ê çi xweliyê li serê xwe bikim. Ax! Nalet lê hatê şivê. Qeda pê ketê şivê. Ax! Keça min a bêtawan, bextereşê Louisonka min.

LOUISON

Bise, bise; bavo, ewqas mede girî; ez hîn bitemamî nemirime.

ARGAN

Tu ji xwe re li dekê vê keçikê binêrin? .De heydê, rabe ser xwe, tişt nabe, ez vê carê li te diborim, bi şertê ku tu careke din wiha mekî, divê tu her tiştî ji min re bibêjî.

LOUISON

Helbet ez ê bêjim, bavo.

ARGAN

Bi kêmanî divê hayê te jê hebe, binêre ev tilîka piçûk hertiştî dizane, ku tu derewan li min bikî, ew ê ji min re bibêje.

LOUISON

Lê, bavo, ji eta min re mebêje ku min ji te re gotiye.

ARGAN

Na, na ez nabêjim.

LOUISON

Ewk, çik bavo, gava ez li jûra eta xwe bûm mêrikek hate wê derê.

ARGAN

LOUISON

Min jê re got tu çi dixwazî, wî jî got ku ew mamosteyê eta min ê muzîkê ye.

ARGAN

Ha, mesele derket ortê. Paşê çi bû?

LOUISON

Eta min hat, paşê

ARGAN

Êê paşê?

LOUISON

Eta min jê re got

"Derkeve, derkeve, here, tu hatiyî vir çi ji bo Xwedê! Derkeve rameweste; qey tu dixwazî serê min têxî belayê."

ARGAN

Êê wekî din?

LOUISON

Lê wî, nexwest ku derkeve.

ARGAN

Baş e wî ji eta te re çi got?

LOUISON

Ez çi zanim komek tişt jê re gotin.

ARGAN

Weke çi, mesele?

LOUISON

Jê re ji aşî ber bajar xeber da; jê re got ku pir ji eta min hez dike, û ku ew keça herî xweşik a vê dinyayê ye.

ARGAN

Paşê çi jê re got?

LOUISON

Paşê jî, li ber wê, çong dan erdê.

ARGAN

Û wekî din?

LOUISON

Wekî din jî, destên wê maçî kirin.

ARGAN

Pîştî wê?

LOUISON

Pîştî wê jî, jinbava min hate ber derî, û ew jî reviya çû.

ARGAN

Wekî din qet tiştekan nebû?

LOUISON

Na, bavo.

ARGAN

Binêre tilîka min a piçûk dixwaze tiştinan bibêje. (*Tiliya xwe dibê ber guhê xwe.*) Tu raweste. Him! Ha, ha! Erê? Ho, ho! Ev e tiliya min a piçûk tiştinên din ku te dîtine û tu ji min re nabêjî ji min re dibêje.

LOUISON

Wî! Bavo, tilîka te ya piçûk derewan dike.

ARGAN

Baş bîne bîra xwe.

LOUISON

Na, bavo, jê bawer meke, derewan dike, bawer bike rast nabêje.

ARGAN

De baş e, baş e! Em ê niha bibînin. Heydê niha rabe biçê û li her-tiştî baş miqate be

Mesekine. Ax! Êdî kesekî zarok nemaye. Ev çi bû hate serê min! Fersenda ku ez li nexweşiya xwe bifikirim jî ji min re nema. Tu rastiye bixwazî, mecala min a ku ez pê bibilikim jî nemaye.

Dîsa li ser kursiya xwe rûdinê.

Sehneya Nehan

(Bêralde, Argan)

BÉRALDE

Hê, ho! Brawo, tu çi dikî? Tu çawayî, baş î?

ARGAN

Ax! Birayê delal, ez pir nexweş im, ji her aliyî ve diêşim.

BÉRALDE

Çawa "tu pir nexweş î"?

ARGAN

Erê welleh, ez ewqas bêhal im ku kesek jî bi halê min nizane.

BÉRALDE

Çawa dibe te dilê min êşand.

ARGAN

Taqeta ku ez karibim bipeyivim jî bi min re nemaye.

BÉRALDE

Ez jî hatim, ji birayê xwe re bêjim, ku qismetekî baş ji biraziya min Angéliqueyê re derketiye.

ARGAN

Ji ser kursiya xwe çeng dibe û bihêrs diaxive: Birawo, ji min re careke din bahsa wê qewadê meke. Ez ê wê rezîlê, wê bêrêzê, wê bidekê ji niha û heta du rojên din bidim ber dêrekê.

BÉRALDE

Hah! Wiha pir baş e te gelekî kêfa min anî ku hinekî bi ser xwe ve hatî, û seredana min bikêrî te hat. De niha bîhna xwe vede! Em ê piştî kar marên xwe bipeyivin. Min komeke pêkeniyan ku

ez bi rê de li wan rast hatim ji bo te aniye, ji bo ku tu hinekî êş mêşa xwe jibîr bikî, û hinekî bîhna te derkeve ku em karibin ji xwe re bihêsanî biaxivin. Endamên komê Misirî ne, cilên Moreyiyana li xwe kirine, him distirênin him dîlanê dikan, ez bawer dikim dê gelekî kêfa te ji wan re bê; ku ji reçeteya Mîrza Purgonî ne baştir bû tu çi dibêji bibêje. Heydê em wan bibînin.

DAWIYA PERDEYA DUDUYAN

Ji bo bîhna wî derbixe, birayê Nexweşê nexweşiyê wî dibe ferca komê, gelek Misirî mêr û jin tevde, cilên Moreyiyana li xwe kirine, him govend û sema digrin him sitranan dibêjin.

PERDEYA SISIYAN

Sehneya Yekê

(Bêralde, Argan, Toinette)

BÉRALDE

Êê! Brawo, çawa bû? Ev yek ji xiyarê şembê*, ku tu dixwî ne çê-tir bû?

TOINETTE

Na xêr, tişteke ciyê xiyarê şembê yê baş nagire.

BÉRALDE

Wer mebêje gidî! Hela virde, tu nayê ku em hinekî ji xwe re di xewle de bipeyivin?

ARGAN

Hinekî xwe ragire, brawo, ez dikim vegerim.

TOINETTE

Bigre, Mîrza, ma tu nizanî ku tu nikarî bêgopal bimeşî.

ARGAN

Xebera te ye.

* Bi latînî jê re dibêjin casse, cûre baqîlek e, li Misir û Hindistanê şîn dibe. Berê wî yê zirav û dirêj, libên wî yên helesor û şêrîn ji bo paqijkirina rêviyan di hekîmtiya kevn de pîr dihate bikaranîn. Jê re xiyarê hindê yan darçîna hindê jî tê gotin.

*Sehneya Duduyan**(Bêralde, Toinette)*

TOINETTE

Ez hêviyê ji te dikim, karê biraziya xwe di ser guhê xwe re mavêje.

BÉRALDE

Ji bo bi miradê xwe şa bibe, çi tiştê ku ji destê min bê ez ê bikim.

TOINETTE

Em çi bikin, divê em bikin ji bo ku em rê nedin vê zewaca betî-betal ku xistiye serê xwe, him min da dîna xwe ku em karibin doktorekî li gorî dilê xwe bînin vir, ji bo ku dilê wî ji Mîrza Purgonî sar bike û delewêreyên ku dike derxe holê dê pir baş bibe. Lê, ji ber ku ji bo karekî wiha kesek li ber destê me tune, ez dixwazim cihûtiyekê lê çêbikim.

BÉRALDE

Çawa?

TOINETTE

Fikreke hinekî komik e. Ne karê mirovên biazil e, lê belkî enca ma wê bixêr be. Tu vê yekê ji min re bihêle tu jî ji aliyê xwe de tevbigere. Eve, mêrikê malê hat.

*Sehneya Sisiyan**(Bêralde, Argan)*

BÉRALDE

Birawo, bəriya hertiştî, ez dixwazim ku tu soz bidî, ku tu yê ji axavtina me bîhna xwe qet teng nekî.

ARGAN

Dibe ez dengê xwe nakim.

BÉRALDE

Divê tu bêyî ku madê xwe tirş bikî bersiva her tiştê ku ez ji te pirs bikim bidî.

ARGAN

Baş e.

BÉRALDE

Li ser tiştên ku em ê bipeyivin, divê bêyî ku em xwe aciz bikin, bêşer û xirecir, bi bîhna fireh û aqilê selîm minaqeşê bikin.

ARGAN

Ji bo Xwedê! Erê. Te ev mesele çiqasî dirêjkir.

BÉRALDE

Ji ku tê, birayê delal, tevî ku tu xwediyê vî hemî milk û malî yî, û ji xeynî keçeke te pê ve zarokên te tunene, ji xwe ez ya piçûk hesab nakim, ez ji te dipirsim, ji ku derket fikra ku tu dibêjî ez ê wê bidim ber dêrekê?

ARGAN

Çawa dibe, birayê ezîz, ma ez ne reyisê malbata xwe me tiştê ku bi min baş be ez nikarim bikim?

BÉRALDE

Xwiyaye jina te jî, ji bo ku tu herdu keçikan jî ji ser serê xwe dahf bidî, ji van şîretên wiha xweşik bi şûn de namîne, û bêşik, ji ber sofîtiya wê ye qey, ku bibîne herdûk jî bûne rahîbe dê gelekî kêfxweş bibe.

ARGAN

Temam! Em dîsa hatin ciyê berê. Serekê hertiştî, ku em vê jinika belengaz nexin nav dev û diranê xwe nabe qey ew e sedema her xirabiyê, ku herkes bi çavê dijminan lê dinêre.

BÉRALDE

Na, birayê min; em wê li wir bihêlin, ew jineke wiha ye ku her

tiştê baş ji bo malbata we dixwaze, û ji her cûre berjevendiya dûr, bi evîneke kûr bi te û bi zarokên te ve girêdayî, ji wan hez dike û ji wan re baş e ev miheqeq ji sedî sed wiha ye. Êdî em bahsa wê nekin, û em vegerin ser keça te. Bi çi aqilî, birayê min, tu dixwazî keça xwe bidî lawê doktorekî?

ARGAN

Bi fikra, birayê delal, ku ez zavayekî bikêrî min bê peyde bikim.

BÉRALDE

Zavayê ku bi kêrî te bê, bi kêrî keça te nayê, birayê delal, him qismetekî wê yê ku baştir bikêrî wê bê heye.

ARGAN

Erê, birayê min, lê yê din bêtir bikêrî min tê.

BÉRALDE

Lê mêrê ku divê bike, brayê ezîz, aya divê ji bo xwe bike an ji bo te bike?

ARGAN

Mêrê ku bike, birayê min, divê him ji bo xwe him jî ji bo min bike, him ez dixwazim ku mirovên pêdiviya min bi wan hebin bên nav mala min.

BÉRALDE

Bi vî aqilî, ger keça te ya piçûk jî mezin bûya, nexwe te yê ew jî bidaya dermansazekî?*

ARGAN

Çima nedim?

BÉRALDE

Mirov ji derdê yên wek te dîn dibe, tu yê kengî ji derdê fikra bi-jîşk û dermansazan xelas bibî, te li xwe kiriye rik ma tu dixwazî li hemberî mirovan, li hemberî xwezayê her nexweş bimînî?

* Li gor Boursaultî, *Lettres nouvelles* (Mongrédiën, t. II, p. 433), ev ifade di textê pêşîn de rastarast wiha hatiye nivîsîn: "Heydê, Mîrza, heydê, xwiya ye tu hîn bûyî ku bitenê bi qûnan re bipeyivî."

ARGAN

Tu dixwazî çî bibêjî, bira can, vekirî bibêje.

BÉRALDE

Ez dixwazim bibêjim, di nav mirovên ku ez nas dikim de kesekî ku ji te kêmtir nexweş be tune, xwezka bedena min jî wek ya te saxlem bûya. Delîlekî mezin ê ku nîşandide ku tu li ser xwe yî û bedeneke te ya bêkêmasî heye, ew e ku tevî hemî tedawiya ku te heta niha dîtiye û hemî dermanên ku te xwarine jî, te nikaribûye ku tenduristiya xwe xera bikî, û ji ber wan hemî heb û dermanên ku bi te dane xwarin jî mala xwedê ava hîn tu nemiriyî.

ARGAN

Lê tu dizanî, bira, ku ez bi saya vê tedawiyê û van dermanan li ser piya me, û Mîrza Purgon dibêje ku bitenê sê rojan dev ji min berde kesek nikare min xelas bike?

BÉRALDE

Ez nizamim, ger tu çavên xwe venekî li xwe hay nebî ew ê ewqas qenc li te miqate be heta ku te bişîne dinya wî alî.

ARGAN

Ka em hişê xwe bidin serê xwe û piçekî bifikirin, birayê delal. Ma qey baweriya te bi zanyariya bijîşkiyê nayê?

BÉRALDE

Na, birayê min, him ji bo noşdariya mirov jî, ez tu sebebê nabînim ku mirov pê bawer be.

ARGAN

Çima? Rastîyeke ku hemî dinya qebûl dike, û herdem rêza wê digire, ji bo çî tu qebûl nakî?

BÉRALDE

Rast qebulkirina wê li derê han, bila di navbera min û te de bimîne, dîniya herî mezin a ku mirov xwe pê digire ye, him gava mirov bi çavê filozofan li tiştan binêre, xwe xapandineke jê mestir, tiştêkî jê komîktir tune, ku mirov bixwaze xwe têkilî karê

saxkirina mirovekî din bike.

ARGAN

Çima tu naxwazî bawer bikî, birayê min, ku mirovek karibe yekî din sax bike?

BÉRALDE

Ji ber ku, birayê delal, heta niha, jêdera mekanîzmaya me mirovan nepenî maye, her sir bûye ku mirov nikaribûye bibîne, him xwezayê jî perdeyên ewqas stur dane ser vê sirê ku imkan tune ye mirov tişteki bibîne.

ARGAN

Nexwe bijîşk tişteki nabînin, nizanin bi hesabê te?

BÉRALDE

Belê dizanin, birayê min. Hemî zanyariyên mirovî dizanin, edebiyatê baş dizanin, latîni xweş xeber didin, navên grekî yên hemî nexweşiyên dizanin, tarifa wan û dabeşkirina wan jî; lê gava ku mesele tê ser rihetkirina nexweşiyên, wê çaxê qet bi tişteki jî nizanin.

ARGAN

Lê divê em vê jî qebûl bikin ku, di vî warî de bijîşk hertim ji kesên din bêtir dizanin.

BÉRALDE

Dizanin, birayê ezîz, tiştê ku min ji te re got dizanin, lê ew jî bikêrî saxkirina nexweşan nayên; him hemî mezinahiya hunerê wan di wan qubedaxiyên wan ên vala de, di wî zimanê wan ê xweşker û hingumeya devê wan de ye, ku hertim li ciyê sedeman peyvan dibêjin û li şûna encaman wadan didin mirov.

ARGAN

Belê di encamê de, bira can, gelek mirovên wek te bîaqil, wek te zana û bîrbir hene; û em dibînin ku gava nexweş dikevin hemî baz didin diçin doktor.

BÉRALDE

Ev jî zeafiyeta mirovî nîşan dide, ne rastiya hunerê wan.

ARGAN

Lê divê bijîşk miheqeq bi hunerê xwe bawer bin, ji ber ku ji bo xwe jî bikar tînin.

BÉRALDE

Erê di nav wan de jî, helbet kesên ku wek xelkê ku ji safîtiya wî îstifade dikin riya xwe şaş dikin hene, lê yên ku wiha nakin û karê xwe dimeşin jî hene. Purgon, weke mînak, qet tiştêkî ji kitekitên wiha fêm nake mirovekî bi her awayê xwe, ji serî heta binî bijîşk e; mirovekî ku baweriya wî ji hemî rastiyên matematîkê bê-tir bi qaîdeyên wî tê, heta daxwaza lêhûrbûna wan jî weke cîniyet dibîne; ji bo wî di hekîmtiyê de tiştêkî nezelal, ku mirov jê bikeve şikê û zor tune, di nav mezinkirinên pêşdaraziyê de, bi hişkiyeke baweriya çavgirtî, prensîbên xwe yên ku dibêje qey bi hisên giştî re, bi aqil û mentiq re lihev dikin bêşert û merc cîbicî dike, bêyî ku li fêde yan zirara wan bifikire hicaman li xelkê dixwe, made û rêviyên wan dişo. Ji bo her çi tiştê ku karibe bi te bike jî divê tu lê megrîji niyeta herî pak a li rû dinyayê dikare te bişîne dinya wî alî, ji ber ku gava te dikuje tiştê ku dike, jixwe bi jina xwe û zarokên xwe jî dike, û gava bi hukûme dê bixwe jî bike.

ARGAN

Bira, xwiyaye derdekî te bi vî ciwamêrî re heye. Lê de ka em wî li aliyekî bihêlin û bigihên encamekê. Gava ku mirov nexweş be, wê çaxê divê mirov çi bike?

BÉRALDE

Qet tiştêkî jî, birayê min.

ARGAN

Qet tiştêkî jî?

BÉRALDE

Qet tiştêkî. Divê bitenê mirov bîhna xwe veke. Gava mirov bihêle, xweza ji xweber bi bîhna fireh xwe ji bêterêziya ku ketiyê rizgar dike. Şika me ye, şerpezetiya me ye ya ku di hertiştî de têk dide, çi bigre hemî mirov ji ber dermanên ku dixwin û di xwe didin dimirin, ne ji ber nexweşiyên ku pê dikevin.

ARGAN

Lê, birawo, divê em li ser vê yekê jî li hev bikin ku mirov dikare bi hin tiştan alîkariya vê xwezayê bike.

BÉRALDE

Ji bo Xwedê! Birayê min, ev gotinên vala ne, ku em hez dikin xwe bi wan bixapînin; û, her dem, ev fikir weke xeyalên xweş li nav mirovatiyê belav dibin, ku em jî bi wan bawer dibin, ji ber ku em jî dilê xwe bi wan xweş dikin û dixwazin ku bi rast bigerin baweriya me bi wan tê. Gava ku hekîmek ji te re bahsa alîkarî bi xwezayê re, gîhaştina hewara wê, sivikkirina barê wê, rizgarkirina wê ji tiştên ku zirarê didinê bike û tiştê ku jê kêmbûye lêvegerîne, wê ji nû ve avabike da ku karibe hemî erkên xwe weke berê bihêsanî pêk bine; gava ku ew ji te re bahsa paqijkirina xwînê, nermkirina rêviyan û demarên mêjî, jêbirina perçivîna fatreşkê, rihetkirina sîngê, saxkirina kezebê, bihêzkirina dil, kêmkirina û paraztina germahiya bedena mirov, û hebûna sirrên dirêjkirina jiyane bi dirêjiya salan bike tu zanibe ku ew ji te re çîrokên romana hekîmtiyê dibêje. Lê gava ku tu li rastiye û li tecrûban vegeerî, tu qet tişteki jî ji wan gotinên vala tê de nabînî, ev yek weke tu ji xewnek ji wan xewnên xweş şiyar bibî û bi rastiya tahl re rûbirû bibî ye.

ARGAN

Tu çima nabêjî ku te hemî zanyanyên dinyayê jiber kirine, û tu dixwazî ji hemî hekîmên mezin ên sedesala me zanatir û bîrewertir bî.

BÉRALDE

Her yek ji hekîmên te yên mezin bi ziman û emelê xwe xwedî du kesayetiyên cihê ne. Gava tu guh bidî axavtinên wan mirovên herî zana yê dinyê ne; lê li tiştên ku dikin binêre mirovên herî nezana û bêkêr ên li rû dinyayê ne.

ARGAN

Ho ho! Tu bûyî doktorekî mezin, biqende ku ez dibînim, him min pir dixwest ku yek ji van hekîmên mezin li vir bûna ku bi zimanê te bigirta û devê te bigirtana.

BÉRALDE

Şerê hekîmtiyê ne karê min e, birayê min; û her kes, kar û zira-ra wî ji wî re, bi çi dixwaze bawer bibe bila bibe. Em ji xwe re di navbera xwe de dipeyivin, min dixwest ku ez karibim hinekî te ji ser şaşiya ku tu dikî vegeřinim, û ji bo hinekî bîhna te derkeve, min pir dixwest ku ez te bibim yek ji wan komediyên ku Molière* di vî warî de nivîsine.

ARGAN

Molière mirovekî xurifi, ji rêderketî ye û komediyên wî jî niha wek wî ne, û bi derxistina ser sehnê ya ciwamêrên bîaqil û kubar ên wek hekîman û henekpêkirina wan jî xwe dike pêkeniyê dinya û alemê.

BÉRALDE

Ew henekên xwe qet bi hekîman nake, henekê xwe bi tiştên pêkenî ku li ser navê hekîmtiyê dibin dike.

ARGAN

Ma bi serê wî ketiye ku di karê hekîmtiyê xeber dide û wê control dike; ev çi mirovekî sersem, çi zirzop e, ku radibe tinazên xwe bi miayeneya nexweşan, bi reçeteyên wan dike, êrîşî civata hekîman dike, mirovên rêzdar ên weke wan diçe derdixe ser sehneya téatrê.

BÉRALDE

Tu dixwazî çi derxe wir, ku pîşeyên cihê yên mirovan dernexe? Prensan û qralan jî her roj derdixin, ku ew jî bikêmanî weke hekîman ji malmezinan in.

ARGAN

Bi cehnima wî kirî! Ku ez hekîm bûma, min heyfa van zimandî-rêjyên wî jê re nedihîşt; û gava ku nexweş biketa jî, min ava mirinê li devê wî nedikir. Bila heta êvarî bi kariya, bibariya, min ne piçek hicam lêdixist, ne jî şirinqeyek lê dixist û min ê jê re bigota. "Bimre, biceheme! Tu yê wê gavê têbigihêyî bê henekê xwe

* Di metnê fransî de peyva *-apothicaire-* hatiye bikaranîn ku wan wê demê li gel derman biharat û tiştên beqaliyê jî difrotin.

bi Fakulta tibê kirin çawa ye."

BÉRALDE

Ez dibînim ku tu gelekî jê hêrs bûyî.

ARGAN

Erê, çortekî dera hanê ye û ger piça aqil di serê hekîman de hebe, dê tiştê ku ez dibêjim bikin.

BÉRALDE

Mereqan mexwe ew ê ji hekîmên te hîn bîaqiltir be, ji ber ku ew ê qet alîkariyê ji wan nexwaze.

ARGAN

Ew ji xwe re dizane, ku alîkariyê ji hekîman nexwaze ew ê ceza-yê xwe bixwe bikşîne.

BÉRALDE

Beleheq naxwaze ku dermanan nestîne, li gor wî divê mirov bîtenê dermanan bide mirovên saxlem, bihêz, ku karibin derdê dermanan bi nexweşiyê re bikşînin; lê ku tu li wî bipirsî, taqeta wî bizorê têra kişandina êşa wî dike.

ARGAN

Çi sebebên xiroxavî! Bes e, ez heyrana birayê xwe me, êdî ez naxwazim ku tu ji min re bahsa vî mêrikî bikî, ji ber ku ev yek êşa ziravê min gur dike, û bi vî awayî tu êş û kulên min tev radikî tîni bîra min.

BÉRALDE

Ez jî weke te dixwazim ku em vê peyvê bişemirînin, birayê min; û ji bo wê jî, ez dixwazim kurt kurmancî vê bêjim ku, ji bo keça te piçekî serhişkî kiriye, divê tu qet biryarên wiha hişk ku tu wê bidî ber dêrekê medî; ji bo hîlbijartina zavayekî jî, divê ji ber ku bîhna te teng dibe tu çavgirtî tevnegerî û divê tu zanibî ku di mijarên wiha de, divê mirov meyla keçikê jî bide ber çavan, ji ber ku dê hemî jiyana wê bi mêrê ku bike re derbas bibe û bextewerîya zewacê jî bi vê yekê ve girêdayî ye.

Sehneya Çaran

(Mîrza Fleurant, Şirinçeyek di destê wî de ya; Argan Béalde)

ARGAN

Wî! Birawo, bi destûra te be.

BÉRALDE

Çi bû? Tu dixwazî çi bikî?

ARGAN

Bi vê şirinçê ez ê lavmaneke piçûk bikim; zêde dirêj najo.

BÉRALDE

Ev tu henekê xwe dikî. Ma tu bêyî ku lavmanekê bikî û bêyî ku dermanan bistînî nikarî bîstekê rawestî? Lavman mavmanan bihê-le careke din, niha hinekî bihna xwe vede, xwe rihet bike.

ARGAN

Mîrza Fleurant, îşev êvarî yan jî sibê zû were.

MÎRZA FLEURANT

JÎ BÉRALDEYÎ RE: TU ÇI TÊ XEBER DÎDÎ LI HEMBERÎ EMRÊN TÎ-BÊ DERRÎKEVÎ Û NAHÊLÎ KU EZ TENKÎYEYA XWE LI MÎRZAYÎ BIDÎM? KENÊ MIROV BI CURETA KESÊN WEK TE TÊ!

BÉRALDE

Heydê rameweste, Mîrza, xwiyaye hingî tu li dereke din a mirovan dinêrî tu nizanî li rûyê mirov binêrî û biaxivî*.

MÎRZA FLEURANT

Mafê te yê ku tu wiha henekê xwe bi dermanan bikî û min jî bi

* Evîna hekîm, Mîrza Pourceaugnac, Hekîmê bi zorê û Dom Juana ku wê demê qedexe bû.

xwe re aware bikî tune. Ez li ser daxwaza bijîşkî bi reçeteya wî hatime, ez ê niha biçim ji Mîrza Purgonî re jî bêjim ku te nehiştîye ez fermana wî pêk bînim û karê xwe bikim. Tu yê niha bibî-nî, em ê bên diyarî hev...

ARGAN

Wey birawo, tu dikî bextreşiyekê bi serê min de bîni.

BÉRALDE

Bextreşiya giran a ku lavmaneke Mîrza Purgonî xwestiye bikî nekî ye! Ez ê vê jî bêjim bila guneh ji stuyê min derkeve, birayê delal, gelo ne mimkun e înkana ku mirov te ji nexweşiya doktorî rizgar bike hebe, ma tu dixwazî, heta dawiya temenê xwe, di nav dermanên wan de bigevizî?

ARGAN

Ji bo Xwedê! Birawo, tu weke mirovekî li ser xwe dipeyvî; lê, ger tu li şûna min bûya, tu yê qet wiha neaxiviya. Gava ku mirov li ser hal û wextê xwe be, pir hêsan e ku mirov li dijî hekîmtiyê bipeyive.

BÉRALDE

Ma çi nexweşiya te heye, tu niha ji min re nabêjî?

ARGAN

Tu yê min dîn û har bikî. Hêviya min ji Xwedê heye ku nexweşiya min bê te, ez ê wê çaxê bibînim bê tu hîn van zimandirêjîyan dikî yan na. Wax! Va ye Mîrza Purgon jî hat.

Sehneya Pêncan

(Mîrza Purgon, Argan Béralde, Toinette)

MÎRZA PURGON

Hîn ku ez di derî re ketim hindur, min xeberên xweş bihîstin, bi rastî jî hinek li vir henekê xwe bi reçeteyên min dikin û derma-

nê ku min nivîsî ne jî red dikin.

ARGAN

Mîrza, ne ku kesekî...

MÎRZA PURGON

Tu ji xwe re li gosirmeta wiha binêrin, serîhildana ecêb a nexweşekî li hemberî doktorê wî.

TOINETTE

TIŞTÊ WIHA JÎ DÏBE.

MÎRZA PURGON

Ew tenkiye min li gor dilê xwe, bi destê xwe amade kiribû.

ARGAN

Ne ez im, yê ku ne...

MÎRZA PURGON

Min ew li gorî hemî qaide û rêzikên hunerê zanistî amade kiribû.

TOINETTE

Neheq e, welleh.

MÎRZA PURGON

Him diviya made û rêviyên te paqij bikira, bikira weke çira şîr.

ARGAN

Birayê min?

MÎRZA PURGON

Mirov tişteki wiha bi şûn de dişîne!

ARGAN

Wî nexwest...

MÎRZA PURGON

Hûn mirov di çavan re derdixin.

TOINETTE

Rast e welleh.

MÎRZA PURGON

Ev suiqesteke mezin e, li dijî zanyariya tibê.

ARGAN

Ji rûwê wî...

MÎRZA PURGON

Li cinayeteke wiha ya ku li dijî Fakulteyê bûye çi ceza bê birîn dî-
sa têrê nake.

TOINETTE

Xebera te ye.

MÎRZA PURGON

Ez ji niha ve dibêjim ku ez hemî dan û sitendinên xwe yên bi te
re qut dikim.

ARGAN

Gişt ji rûwê birayê min...

MÎRZA PURGON

Êdî mervatî û xinamtiya bi te re jî min navê

TOINETTE

Tu yê qenc û xweş bikî.

MÎRZA PURGON

Û ji bo hemî têkiliyên bi te re bibirim jî, va ye seneda ku min ji
bo braziya xwe, weke diyariya dawetê çêkiribû.*

ARGAN

Birayê min ev xirabî hemî bi min kir.

MÎRZA PURGON

Hûn lavmana min kêr dibînin!

ARGAN

Bila bînin, ez ê aniha li xwe bidim.

* Senedê diçirîne û perçên we bi hêrs davêje.

MÎRZA PURGON

Halbikî, min ê te nêzîk nedûr ji vî derdî rizgar bikira.

TOINETTE

Ne layiqî vê ye.

MÎRZA PURGON

Min ê bedena te paqij bikira û hemî tiştên nebaş ên di xwina te de, belxem, zirav û hwd. paqij bikira bavêta.

ARGAN

Ax birê min te çi anî serê min!

MÎRZA PURGON

Him ji duzîneyeke pê ve.tir jî derman ne lazim bû, ji bo ku min binî li kîsê te yê zirav baniya.

TOINETTE

Ne hêjayî tedawiya te ye.

MÎRZA PURGON

Lê piştî ku te nexwest li ser destên min rihet û sax bibî, tu ji xwe re zanî.

ARGAN

Ne sûcê min e.

MÎRZA PURGON

Piştî ku te kêmasî xist rêzgirtina ku her nexweş deyndarê doktorê xwe ye.

TOINETTE

Divê ev heyf jê re nemîne.

MÎRZA PURGON

Piştî ku te li hemberî dermanên ku min ji te re nivîsî bûn serî hilda...

ARGAN

Haşa! Ma ez qet tiştê wiha dikim.

MÎRZA PURGON

Ez jî ji te re dibêjim ku, ez te û wê bedena te ya riziyayî, wan rê-
viyên te yên xirabe, wê xwîna te ya reşbûyî, wî ziravê te yê jah-
rîbûyî, bi wê belxema te ya genî re dihêlim û diçim.

TOINETTE

Tu çê xweş dikî.

ARGAN

Ji bo Xwedê!

MÎRZA PURGON

Û ez hêvî dikim ku, berî çar roj di ser te re derbas bin tu bikevî
halekî ku tu jê ranebî.

ARGAN

Ez ketim bextê te! Bila dilê te bi min bişewite.

MÎRZA PURGON

Maşalê madê te tirş bibe, (bradypepsie)* bibî.

ARGAN

Mîrza Purgon!

MÎRZA PURGON

Piştire jî berşoşkî (dyspepsie)** bibî.

ARGAN

Mîrz Purgon!

MÎRZA PURGON

Bi ser wê de jî tetirxanî (apepsie)*** bibî

ARGAN

Mîrza Purgon, ez xulamê te me!

MÎRZA PURGON

Piştî wê zikêşî (lienterie)**** bibî...

* Hezma zehmet û giran.

** Nexweşiyêke made ye, ku dibe sedemê zoriya hezîm kirinê

*** Nexweşiya made ku mirov ji ber nikare tiştêkî hezîm bike.

**** Nexweşiya ku mirov ji ber xwarinê nêvhezîmkirî derdixe.

ARGAN

Mîrza Purgon!

MÎRZA PURGON

Bi wê jî nemînî, zikê te xwin here, (dysenterie)* bibî.

ARGAN

AX! Mîrza Purgon!

MÎRZA PURGON

Ji wê jî, Xwedê bike av di canê te bigere, (hydropsie)** bibî...

ARGAN

Mîrza Purgon!

MÎRZA PURGON

Taliyê jî tu xêrê ji xwe nebînî, cezayê bêmêjîtiya xwe li dinya din bibînî.

Sehneya Şeşan

(Argan, Béalde)

ARGAN

Ax, Xwedêwo! Ez mirim. Birayê min, ez wenda kirim.

BÉRALDE

Çi bû? Çi qewimî gidî?

ARGAN

Ez nema karim debar bikim. Ez ji niha ve his dikim ku hekîmtî heyf û tola xwe ji min digire.

* Bawesîra bixwîn.

** Nexweşiya sîrozê, dibe sedema ku di ciyê divê av tê tunebe yê bedena mirov de av kom bibe.

BÉRALDE

Hey wax! Birayê hêja, tu xurifiyî çî ye, te li vir got li ciyekî din mebêje, bila kes dengê te mebihîze. Hinekî li dora xwe binêre, ez hêviyê ji te dikim, hişê xwe bide serê xwe û wesweseyên wi-ha ji xwe re çê meke, xeyalan mebîne.

ARGAN

Te nedît, bira, mêrik bi çî nexweşiyên malkambax tirs bi min firand.

BÉRALDE

Tu çî mirovekî saf û dilhênik î!

ARGAN

Te nebihîst, ku got çar roj di ser te de derbas nabin kesek nema kare te rake ji vî halî.

BÉRALDE

Bila bêje heta serê wî biêşî, wê çî bibe? Aya di fala xwe re nêrî, ma şêx e ev zilam? Gava mirov te guhdarî dike, mirov dibêje qey ecelê te di destê Mîrza Purgonî de ye, û ew bi kêfa xwe, kîjan gava canê wi bixwaze temenê te dirêj an kin dike. Ji bîra meke ku prensîbên jiyana te di destê te bixwe de ne, û weke ku hêrsa Mîrza Purgonî nikare te bikuje dermanên wî jî nikarin te rakin. Ger tu bixwazî, fersendek ji ya îro çêtir tuneye, ku tu xwe ji hekîman rizgar bikî, lê ku tu bêjî ez nikarim bêyî wan bijîm, nexwe diya hekîman nemiriye, tu dikarî ji xwe re yekî din bibînî, birayê delal, him belkî yê ku tu bibînî ji vî baştir be.

ARGAN

Ax! Birayê min, tu nizanî ku kesek ji wî baştir bi derdê min nizane û nikare weke wî min kontrol bike.

BÉRALDE

Divê ez ji te re rastiyê bêjim ku tu tiştan di serê xwe de mezin dikî, û tu hertiştî bi çavekî seyr dibînî.

Sehneya Heftan

(Toinette, Argan, Béralde)

TOINETTE

Mîrza, va ye hekîmek hatiye dixwaze te bibîne.

ARGAN

Hekîmê çi?

TOINETTE

Hekîmê hekîmtiyê.

ARGAN

Ez ji te re dibêjim kî ye, navê wî çi ye?

TOINETTE

Ez wî nas nakim; lê dirûvên wî pir bi min dikevin, tu dibêjî qey em ji dê û bavekî ne, bi rastî jî ku ez bi diya xwe baş ne bawer bûma ku jineke xwegirtî bû, min ê bigota piştî mirina bavê min ji min re birayekî piçûk ji hinekan peyde kiriye.

ARGAN

Ka bang bikê bila bê.

BÉRALDE

Xwedê li gor dilê te yê saf dide te
doktokek diçe, yê din bixweber tê.

ARGAN

Hela hiş be, ez ji zimanê te yê dirêj pir ditirsim, tu yê dîsa belayekê bînî serê min.

BÉRALDE

Dîsa dest bi dehyeka xwe meke! Tu diçî û têtî vedigerî ser eynî meselê.

ARGAN

Tu nabînî? Kula wan hemî nexweşiyên ku ez navê wan jî nizamim ma di dilê min de, ev...

Sehneya Heştan

(Toinette, Weke Hekîm; Argan, Béralde)

TOINETTE

Mîrza, bi destûra te be, ez hatim te bibînim û bêjim ku ez amade me ji bo her cûre xizmeta hicamat û lavamatên ku pêdiviya te pê hebe.

ARGAN

Mîrza, ez ê vê qenciya te ji bîra nekim. *(Ji Béraldeyî re)* Li ser bextê min! Mirov dibêje qey Toinette bixwe ye.

TOINETTE

Mîrza, ez hêvî dikim ku tu ye li min biborî, min jibîra kir min ê tiştêk ji xulamê xwe re bigota; ez ê aniha vegerim.

ARGAN

Tu çi dibêjî! Mirov nabêje qey birast jî Toinette bixwe ye?

BÉRALDE

Rast e, drûvên wan pir bi hevdu dikeve. Lê mirov gelek caran rastî tiştên wiha tê, him pirtûkên çîrokên bi van bûyerên seyr ên xwezayê tije ne.

ARGAN

Ji bo min, tiştêkî nedîtî bû, him...

Sehneya Nehan

(Toinette, Argan, Béralde)

TOINETTE

Cilên xwe yên hekîmtiyê ewqas zû diguhere ku, zor e mirov têbigihê ku ew bû ya bi cilên hekîman derketibû ser sahnê: Qey te gazî min kir Mîrza?

ARGAN

Çawa?

TOINETTE

Te gazî min nekir?

ARGAN

Min? Na.

TOINETTE

De qey ba bi ber guhê min ket.

ARGAN

Hinekî xwe li vir ragire binêre bê çendî ev hekîm dişibihe te.

TOINETTE

Li derketinê, dibêje: Erê, birastî jî, lê li jêrê komek karê min heye, him min ew têra xwe dît.

ARGAN

Ger min her du jî nedîta, min ê bawer nekira, bigota qey her du jî yek in.

BÉRALDE

Li ser vê cure drûvpêketinê min tiştên ku baweriya mirov pê nayên pir xwendine, û îro jî mirov rastî tiştên wiha ku gelek kes pê diweritin tê.

ARGAN

Welleh ez jî bûma, ez ê bi drûvpêketineke wiha bixapiyama û min ê sond bixwara ku her du jî yek in.

Sehneya Dehan

(Toinette, Weke Hekîm; Argan, Béralde)

TOINETTE

Mîrza, ez ji dil û can ji we lêborînê dixwazim.

ARGAN

Ez heyrana te me!

TOINETTE

Ez hêvî dikim, ku tu yê ji ber meraqa min a ku min xwest ez nexweşekî wek te, ku nav û dengê wî li her derê belav bûye bibînim, li min negirî; him şûhreta te ya ku li her derê belav bûye dikare bibe sedemê lêngirtina min.

ARGAN

Mîrza, ez di xizmeta te de me.

TOINETTE

Ez dinêrim, Mîrza, ku tu pir bi serinc li min dinêrî. Bi texmîna te ez çend salî me?

ARGAN

Ez dibêjim qey çiqas hebe tu dikarî bist û şeş an bîst û heft salî bî.

TOINETTE

Ho ho! Tu ji xwe re çi dibêjî gidî, ez tam not salî me.

ARGAN

Not salî?

TOINETTE

Erê. Tu dibînî ku ez heta vî temenê xwe karibûme wiha ciwan,

wiha liserxwe bimînim, hemî bi saya sirrên hunerê min e.

ARGAN

Tu ji xwe re binêrin! Çi kalekî bedew, kî dikare bêje ku not salî ye?

TOINETTE

Mîrza, ez hekîmekî gerok im, ez gund bi gund, bajar bi bajar, welat bi welat digirim, ji bo mijarên li gor dilê xwe, nexweşên hêjayî mijûliya xwe, da ku derfeta pêkanîna wan sirrên mezin û delal ên hekîmtiyê, ku min peyde kirine bidin min bibînim. Ez li xwe danênim ku wexta xwe bi wan nexweşiyên hêsan re, wek bawîbûn û bapêşîbûna hûrikmûrik, wek taya sivikmivik, wek bêhnçikandin û serêşiyê, beleheq derbas bikim. Ez li nexweşiyên girîng digirim agirên bêrawestan li gel jipesnapeyivînan, hiraretên ku mirov ji ber wan dinale, webayên baş, zikên ji ber avgirtinê werimî wek zebeş, zatulcenbên li gel sîngên bi kul û birîn. Kêfa min ji wan re tê, ez ê li koka wan bikolim, qira wan bînim; min pir dixwest, Mîrza, ku ev nexweşiyên min navên wan jimar-tin hemî bi te re hebûna, hemî tebîb û hekîman dev ji te berda-bûna, bêhêvî, di ber sikratê de bûnayî, ji bo ku min tesîra dermanên xwe û hewesa xizmeta xwe nîşanî te bidana.

ARGAN

Te ez xistim bin barekî wiha, Mîrza, ku ez nizanim dê çawa ji bin barê qenciya te derkevim.

TOINETTE

Ka rehjena xwe bide min. Heydê, weke ku divê bavêje. Wey, tu raweste ku ez te çawa bînim rê. Hoy, ev rehjen bêperdaxiyan dike. Ez rind dibînim ku tu hîn min qenc nas nakî. Doktorê te kî ye?

ARGAN

Mîrza Purgon.

TOINETTE

Navê vî mêrikî qet di nav navên hekîmên mezin ên di deftera min de tune ye. Ji te re negot ku nexweşiya te ji ber çî ye?

ARGAN

Ew dibêje ku ji ber kezeba reş e, û hin jî dibêjin ji ber fatreşkê ye

TOINETTE

Gişt nezan in, naşî ne. Tu ji ber kezeba sor nexweşî.

ARGAN

Ji ber kezeba sor?

TOINETTE

Erê. Tu xwe çawa his dikî?

ARGAN

Car caran ez tê derdixim ku êş dikeve serê min.

TOINETTE

Temam, kezeba sor e.

ARGAN

Carinan bi min wiha xwiyaye, ku weke perdeyek li ber çavên min be.

TOINETTE

Ji ber kezeba sor e.

ARGAN

Hin caran jî dilê min diêşe.

TOINETTE

Kezeba sor.

ARGAN

Yek caran jî her derê min hişk dibe.

TOINETTE

Kezeba sor.

ARGAN

Hin caran jî êşeke wiha dikeve nava min, ku ez dibêjim qey ez qolincî bûme.

TOINETTE

Kezeba sor. Tu xwarîna xwe bi awayekî ku dilê te dibijiyê dixwî?

ARGAN

Erê, Mîrza.

TOINETTE

Kezeba sor Tu hinekî jî ji vexwarîna şerabê hez dikî?

ARGAN

Erê, Mîrza.

TOINETTE

Kezeba sor. Piştî xwarînê hinekî xewa te tê û tu hezdikî hinekî rakevî?

ARGAN

Erê, Mîrza.

TOINETTE

Ez ji te re dibêjim kezeba sor, kezeba sor. Ji bo xwarînê doktorê te ji te re çi pêşniyaz dikir?

ARGAN

Ji min re digot şorbê bixwe.

TOINETTE

Nezanê nezan.

ARGAN

Goştê mirîşkan.

TOINETTE

Nezan.

ARGAN

Goştê golikan.

TOINETTE

Xeşîm.

ARGAN

Tiştên kelandî.

TOINETTE

Nezan.

ARGAN

Hêk.

TOINETTE

Nezan.

ARGAN

Û êvaran ji bo rêviyên min nerm bike xweşava incasên hişkiri.

TOINETTE

Naşî.

ARGAN

Bi taybetî jî dixwest ku ez şeraba xwe gelek av tevli bikim û vexwim.

TOINETTE

Nezan, xeşîm, naşî. Divê qet tu avê nexî şeraba ku tu vedixwî; û ji bo tîrkirina xwina te ya ku rohn e, divê tu goştê qelew ê dewarên dermale, yê berazên dermale, penîrê bidohn ê Hollanda, savar û birinca têr rûn bixwî, ji bo ku baş eqda xwe bigre û bê ser kewna xwe ya ewilî jî şembelot û helawa dimsê bi qinên guzan divê tu bixwî. Hekîmê te heywanekî dera han bûye. Ez dixwazim ji te re yekî ku li ber destê min rabûye bişînim, û heta ku ez li vî bajarî bim ez ê bêm carinan te bibînim.

ARGAN

Ez deyndarê te me heta ku ez hebim.

TOINETTE

Tuxwedê! Tu çi dikî ji vî milê xwe tu ji min re nabêjî?

ARGAN

Çawa?

TOINETTE

Ger ez li şûna te bûma, min ê wê gavê jê bikira bavîta.

ARGAN

Lê, tu ji min re nabêjî çima?

TOINETTE

Tu nabînî ku qeweta hemî xwarinê dikşîne bi aliyê xwe de, û nahêle ku aliyê din jê fêdê bibîne?

ARGAN

Erê, lê pediviya min bi milê min heye.

TOINETTE

Binêre çavê te yê rastê jî, ku ez li şûna te bûma min ê ew jî derxista.

ARGAN

Ez ê çawa çavê xwe derxim?

TOINETTE

Tu nabînî ku çawa zora yê din biriye, qeweta wî jê stendiye? Bawer bike ji min, divê tu wî zûka derxî bavîjî, tu yê bi çavê çepê hîn çêtir bibînî.

ARGAN

Niha ne hewara wî ye.

TOINETTE

Bi xatirê te, min nedixwest ku ez welê zû terka te bikim; lê divê ku ez xwe bighînim ser muayeneyeke mezin, ez ê li mirovekî ku doh miribû binêrim.

ARGAN

Tu yê li mirovekî ku doh miriye binêrî?

TOINETTE

Erê, da ku binêrim, bê ji bo ku mirov ew rihet bikira çi diviya. Heta careke din.

ARGAN

Tu dizanî ezbenî, nexweş qet nikarin mêvanên xwe verê bikin.

BÉRALDE

Ev e hekîmekî ku bi rastî jî têra xwe zana xwiyaye.

ARGAN

Erê, lê hinekî pir ecele dike.

BÉRALDE

Hemî hekîmên mezin wiha ne.

ARGAN

Milekî min jê bike, çavekî min derbixe, da ku yê din baştir bibe?
Min jê qebûle bavo bila hîn baştir nebin. Wele xweş emelyat e,
bila min kor û qop bike!

Sehneya Yazdan

(Toinette, Argan, Béralde)

TOINETTE

Weke ku bi hinekan re bipeyive dike: Heydê, heydê, ez cêriya te me, min bi halê min bihêle ez nikarim bikenim.

ARGAN

Çi ye, çi diqewime?

TOINETTE

Doktorê te, rûwê min bi reş be! Dixwaze rehjena min bigire.

ARGAN

Tu ji xwe re lê binêrin, mêrikê not salî dixwaze çi bike!

BÉRALDE

Êê, birawo, piştî ku navbera te û Mîrza Purgonî jî nemaye, tu nax-

wazî ku ez hinekî ji te re qala qismetê ku ji biraziya min re derketiye bikim?

ARGAN

Na, birayê min. Piştî ku biya min nekir û li hemberî min rabû, ez ê wê bidim ber dêrmêrekê. Ez dinênim ku mûyek di vî mastî de heye, dilê wê ketiye kesekî din, di quncikan de hev dibînin, hayê min jê heye, lê ew tê nagihê.

BÉRALDE

Baş e dê çi bibe! Birayê hêja, ku dilê wê bi ser hinekan de ye, nexwe ne qebebet e, him tu çima xwe diqeherîni, piştî ku dê li gor adetê bi awayekî birûmet bi hev re bizewicin dê çi bibe?

ARGAN

Çi dibe bila bibe, birayê min, ez ê wê bikim dîndar, min biryara xwe daye çûye.

BÉRALDE

Ez tê dighêm, tu dixwazî dilê hinekan rihet bikî.

ARGAN

Ez dizanim ku tu dixwazî çi bibêjî. Tu yê herî bêyî vegeerî ser yek û duduya xwe, ku tu girran navêjî jina min dilê te rihet nabe.

BERALDE

Bila wek te be! Erê, birayê min, piştî ku em ji dilê safî ji xwe re dipeyivin, niyeta dilê min jî ew bû; him ji derdê hekîmên te bêtir, ez ketime heyra te ku tu ewqas stuyê xwe li ber wê xwar dikî û çavê xwe ji hemî xefikên ku li pêşiya te vedide re digrî.

TOINETTE

Wî! Mîrza, qet navê Xanimê mêne ser zimanê xwe

Jineke di ser pozê xwe re ye, mafê kesî tuneye ku dev bavêjîyê, gotina devê wê û ya dilê wê yek e, him ew ji mêrê xwe hez dike û mêrê wê jî jê hez dike... Divê mirov gunehê wê hilneyne.

ARGAN

Jê bipirse bila ji te re bibêje ku çiqasî dilê min xweş dike.

TOINETTE

Erê welleh, rast e.

ARGAN

Ku çendî li ber nexweşiya min dikeve.

TOINETTE

Bêguman.

ARGAN

Him çawa li min miqate ye, derdê min dikşîne û ji min venabe.

TOINETTE

Qet jê re şik tune ye. (*li Beraldeyî dizîvire*) Tu dixwezî ku ez bawerîya te bînim, aniha nîşanî te bidim, ku Xanim ji Mîrzayî çendî hez dike? (*Vedigere ser Argan*) Mîrza, ji kerema xwe re destûra min bide ku ez rê bidimê bê çendî xapiyaye, û çewtiyeke çawa dike.

ARGAN

Çawa?

TOINETTE

Xanim dike vegere. Tu xwe li ser rûnişteka xwe dirêj bike, û weke ku tu miribî bike. Gava ku ez xebera reş bidimê, tu yê bibînî ku çendî dilê wê li ser te diêşe.

ARGAN

Baş e, ez jî dixwazim.

TOINETTE

Erê; lê wê zêde jî bêhêvî meke, Xwedê neke dikare dilmilê wê lê here.

ARGAN

Tu wê ji min re bihêle.

TOINETTE

Ji Béraldeyî re: Tu jî xwe li vê quncikê veşêre.

ARGAN

Mirov xwe li mirîtiyê dîne tiştek bi mirov nayê ne wiha?

TOINETTE

Na, na. Wê çi bi te bê? Bitenê tu xwe li wira dirêj bike bes e. (*Bi dengêkî nizm.*) Şermezarkirina birayê te dê pir xweş be. Va ye, Xanim tê. Xwe baş bigre û xwe tev mede.

Sehneya Duwazdan

(Béline, Toinette, Argan, Béralde)

TOINETTE

Diqîre: Wî, Xedewo! Hayho, ev çi bobelat bû bi serê me de hat!
Ax, ev çi karesat bû bi serê me de hat!

BÉLINE

Çi bû, çi biliya Toinette?

TOINETTE

Haware, Xanim!

BÉLINE

Keçê çi bûye tu ji min re nabêjî?

TOINETTE

Mêrê te mir.

BÉLINE

Mêrê min mir?

TOINETTE

Erê, mixabin! Rahma Xwedê lê be, çû ser heqiya xwe.

BÉLINE

Tu baş dizanî ku miriye?

TOINETTE

Belê. Hîn hayê kesî jî ji tiştê ku bi serê me de hat çênebûye, û ez bitena serê xwe li vê derikê bûm. Di nav destê min de can da, bêkeso. Va ye, binêre, bûye weke terş li ser wî textê hişk ê biring.

BÉLINE

Ox! Mala Xwedê sed carî ava! Ez ji barekî giran xelas kirim. Tu çi bêhiş î, dînik î, Toinette, te çi xwe li ser kuşt nexwe kesekî wek wî nemiriye!

TOINETTE

Ez çi zanim, Xanima min, min got qey divê mirov bide girî.

BÉLINE

De here dev jê bigere, ne hêja ye ku tu serê xwe pê re biêşînî. Kesekî weka wî li nav goristanê tuneye qey? Ma bi kêrî çi dihat li vê dinyayê? Mirovekî ku rihetî nedida kesekî, kotî, evdalekî dera han bû, her gav lavman an jî dermanê zikêşê di nava wî de dikir qurequr, bêrawestan fiş dikir, dikuxiya, tif dikir, bêmêjî, zivêrker, madê wî tirş bû, bêrawestan mirov diwestand, bişev û biroj bi xulam û qewraşan re şer dikir.

TOINETTE

Ev e, qey divê mirov li pey miriyan wiha xweş xeber bide!

BÉLINE

Toinette, divê niha tu alîkariya min bikî, ku ez plana xwe cîbicîh bikim, û divê tu zanibî ku ji bo vê alîkariyê jî mafê renca te misoger e. Him, Xwedê kirî, ku hîn hayê kesî jî ji bûyerê çênebûye, ka em wî bibin têxin nav ciyê wî, û ji kesî re nebêjin ku miriye, heta ku ez karê xwe hal bikim. Sened, tapo, pere û zêrên ku ez dixwazim dest bidim ser hene, him nexwe min salên ciwaniya xwe yê herî xweş pê re beleheq derbas nekirine. Were, Toinette, divê beriya giştî em van miftan hemiyan hilînin.

ARGAN

Bi carekê re radibe ser piyan: Hêdî, hela hinekî sebir bike.

BÉLINE

Şaş û matmayî, tirsiyaye: Ayî!

ARGAN

Erê, Xanim ku jin ne wek te bin, hezkirina te ev bû?

TOINETTE

Pî, pî! Gorbuhîşt nemiriye.

ARGAN

Ji Belineya ku derdikeve re: Ez gelekî kêfxweş bûm, ku min dît bê tu ji min çawa hez dikî û li paş min çawa xeber didî. Ev e derseke ku dê hişê min bîne serê min û nehêle bêrêtiyên ku min ê bikira bikim.

BÉRALDE

Ji cihê ku xwe lê veşartibû derdikeve: Çawa bû, birayê min, te ew bi çavê xwe dît ku dixwest çi bike.

TOINETTE

Li ser bextê min! Ku min bi çavê serê xwe nedîta qet min ji tiştêkî wiha bawer nedikir. Ka raweste dengê keça te tê. Xwe dîsa weke berê dirêj bike, em binêrin bê li hemberî xebera mirina te, ka ew ê çi bike. Tecrûbeyeke wiha dê ne xirab be; çawa be te carekê dest pê kiriye, tu yê hisên malbatê yên li hemberî xwe bi vî awayî baş hîn bibî.

Sehneya Sêzdan

(Angélique, Argan, Toinette, Béralde

TOINETTE

Diqêre: Hawar e Xwedê! Ax, ev çî bû hate serê me, ev çî roja bê-yom e!

ANGÉLIQUE

Çî bi te hatiye, Toinette, him tu li ser çî diçiriyî, te xêre welê?

TOINETTE

Hey wax! Mala min ê, xebera nexêrê qey para min e, ku ez bi-dim te.

ANGÉLIQUE

Keçê çî bûye gidyanê, tu çîma nabêjî?

TOINETTE

Bavê te mir, ma ez ê hînê çî bibêjim.

ANGÉLIQUE

Bavê min mir, Toinette?

TOINETTE

Erê; tu dibînî wa ye li wir e. Aniha dilê wî lê çû, neda pêş û paş mir rebeno.

Hayho Xwedêwo! Ma me çî kiribû ku ev bobelat hate serê me! Ev çî tofan bû li me qewimî! Qey wexta bavê min û ve yekê bû ku me bihêle û here, ma jî wî pê ve kî yê me heye li vê dinya-yê? Bavê min çû, him jî di wexteke ku min dilê wî jî xwe hişt, ew qeherand! Ez sebeb im, ez ê çî xweliyê li serê xwe bikim, li min pepûkê, piştî çavên bavê xwe ez ê sebra xwe bi kê bînim?

Sehneya Çardan Ya Dawiyê

(Cléante, Angélique, Argan, Toinette, Béralde)

CLÉANTE

Çi derdê te heye, delalê Anguélique? Çi bû ye, tu ji bo çi digiriyî?

ANGÉLIQUE

Heyf û mixabin! Ez nedim girî dê kî bide girî, ma qey min tişteki hindik wenda kiriye, ezîzê ber dilê min çû

CLÉANTE

Haho Xwedê! Çima bextê me wiha bi reş e! Ev mirina bêwext qey para me bû! Mixabin! Min ji apê te rica kiribû ku te ji bo min ji bavê te bixwaze, ez jî hatim ku xwe pê bidim. naskirin, rêz û hirmetên xwe pêşkêş bikim, li ber bigerim ku destûra wî bigrim ji bo te bide min.

ANGÉLIQUE

Ax! Cléante, ji min re êdî bahsa vê yekê meke. Fikra zewacme-wacê êdî jibîr bike. Piştî mirina bavê xwe, ez nema dixwazim bi-minim li darê vê dinyayê, ez ê ji her tiştî destên xwe bişom. Erê, bavê min lo, ger ku ez berî li hemberî daxwaza te hatibim jî, ez ê niha bi kêmanî tişteki ku te ji min dixwest bînim cîh. Bi vî awayî piçekî be jî, ez ê bîhna bavê xwe ya ku min teng kiribû fireh bikim belkî. *(Li ber bavê xwe çong dide)* Divê tu zanibî bavo, ez aniha li vir soz didim te, ez ê biçim ber dêrekê, ez ê xwe bikim rahîbe, tu yî şahidê soza me û cara dawîn dixwazim bêm himbêza bavê xwe.

ARGAN

Radibe ser xwe: Ax rihê min, keça min!

ANGÉLIQUE

Saw digre. Ayî!

ARGAN

Were ba min. Êdî qet metirse, ez ne mirime. Were, tu ji xwîna min î, tu keça bavê xwe yî; min dilê te yê pak dît ez hîn kêfxweş bûm.

ANGÉLIQUE

Ax! Te ziravê min qetand, bavo! Madem Xwedê ev bexteweriya mezin da min û tu li min vegerandî, destûra min bide ku ez bêm dest û piyên te û tiştêkî bitenê ji bavê xwe bixwazim. Ger tu meyla dilê min qebûl nekî, destûra zewaca bi Cléanteyî re nedî, ez cêriya te me tu yê ji bo zewaca bi kesekî din re jî zorê li min nekî. Ez wekî din ji te tiştêkî naxwazim.

CLÉANTE

Xwe tavê dest û piyê wî: Ax! Mîrza, ez xulamê te me, tu yê rica me her duyan jî qebûl bikî, û li hemberî daxwaza pîroz a dilê me yê saf û pak dernekevî.

BÉRALDE

Birayê hêja, qey haşa dilê te ne kevir e?

TOINETTE

Mîrza, qey dê dilê te li hemberî ewqas eşq û evînê nerm nebe?

ARGAN

Bila bibe hekîm, ez ê bi zewaca wan razî bibim. Erê, bibe bibe hekîm, ez ê keça xwe bidim te.

CLÉANTE

Ser ser û çavên min, Mîrza

ku şertê ez bibim zavayê te bitenê ev be, ez ê bibim hekîm, he-ta ji bo xatirê te ez ê bibim dermansaz jî. Ji bo min ji vê rihettir tiştêk tuneye, him ji bo xatirê çavê Angéliqueya delal çi heye ku ez nikarim bikim.

BÉRALDE

Ka guhdariya min bike, birayê delal, fikrek hat bira min
Tu bixwe çima nabî hekîm?! Dê karê te hîn hêsantir bibe, her tiştekî ku ji te re lazim be tu yê bi xwe bikî.

TOINETTE

Welleh rast e. Ev e rîya herî baş, ji bo ku tu zû rihet bibî; wê gavê ji bavê kîjan nexweşiyê zêde ye ku bi siheta hekîmekî bilîze.

ARGAN

Birayê min, ez dibînim ku tu dixwazî henekê xwe bi aqilê min bikî ma niha wexta min û xwendinê ye?

BÉRALDE

Xwedimendin çi hewce ye! Tu têra xwe zana yî; di civata hekîman de gelekên ku biqende te jî nizanin hene.

ARGAN

Lê bikêmanî divê mirov baş Latînî zanibe, navên nexweşiyên zanibe, dermanê ku ji wan re lazim be zanibe saz bike.

BÉRALDE

Gava ku tu cube û kumê hekîmtiyê li xwe bikî, tu yê van tiştan hemîyan jî hîn bibî, him tu yê paşê bibînî ku tu çawa dibî hekîmekî di ser pozê xwe re.

ARGAN

Çawa? Dema ku mirov van cîlan li xwe dike mirov hîn dibe ku li ser nexweşiyên xeber bide?

BÉRALDE

Erê. Bi cubeyekî û kumekî karê te tune hema ji xwe re xeber bide, her peyveke te ya tewşomewşo dê bibe zanyarî, û her xêvitiyek dê bibe huner.

TOINETTE

Binêre, Mîrza, ku qet tiştekî te tunebe jî, rîha te têra hertiştî dike, him rîh nîv hekîmî, heta belkî jê zêdetir e jî.

CLÉANTE

Çi dibe bila bibe, ez ji her tiştî re amade me.

BÉRALDE

Arganî re: Tu dixwazî ku em vî karî zû çareser bikin?

ARGAN

Çawa, zû hal bikin?

BÉRALDE

Erê, li vir, li mala te.

ARGAN

Li mala min?

BÉRALDE

Erê. Ez Fakulteyekê nas dikim, hemî hevalên min in, dê bîsteke din bîn seremoniyekê li hola te çêkin. Him dê tu mesrefa te jî lê neçe.

ARGAN

Baş e, lê ez ê çî bibêjim, çî bersiva wan bidim?

BÉRALDE

Bi du peyvan ew ê hînî te bikin, û tiştê ku divê tu bêjî jî, dê binivîsin bidin destê te. Heydê niha biçe cilûbergên xwe yên xweşik bi ser bejna xwe de berde, ez ê jî hinekan bişînim pey wan da ku bîn.

ARGAN

Heydê, em binêrin bê çî dibe.

CLÉANTE

Tu dixwazî çî bibêjî, û ev Fakulteya nasên te dê ji me re çî bike.

TOINETTE

Bi rastî jî, mebesta te çî ye?

BÉRALDE

Ez dixwazim ku îşev em tev de ji xwe re hinekî bîhna xwe derxin. Pêkeniyên seremoniya diploma hekîmekî kirine weke listikeke navberîdanê ya bi sitran û govend; ez dixwazim ku em hemî

bi hev re beşdarî vê liskê bibin, wexteke xweş derbas bikin û brayê min jî di serê vê govendê de be.

ANGÉLIQUE

Lê divê ez ji apê xwe yê delal re bibêjim, ez dinêrim ku tu ji xwe re hinekî zêde bi bavê min dilîzî.

BÉRALDE

Na, biraziya min, ku em hinekî ji xwe re li leknê bavê te dixin ev nayê mana ku em zêde henekê xwe pê dikin. Di nav me de keskî biyanî tune ye, em xwebixwe ne. Heta em dikarin her yek ji me rolekî bigre, û bi vî awayî em yek ji bo yekî bibin pêkeniyê hevûdu. Dema mîhrîcanan tiştên wiha dibin. Heydê em zû biçin hertiştî amade bikin.

CLÉANTE

Ji Angéliqueyê re: Tu bi vê yekê raziyî?

ANGÉLIQUE

Belê, piştî ku yê serkêşiya vî karî dike apê min e, çima ez ê bêjim na.

DAWIYA PERDEYA SISIYAN

LÎSKA NAVBERIYÊ

Ev seremoniyeke pêkenî ya bi peyv, sitran û govend a ji bo mirovekî ku dibe hekîm e.

DESTPÊKA BALEYÊ

Gelek raxer bi tevgerên rîtmîk tên holê amade dikin û rûniştikan bicîh dikin; piştî xelaskirina vî karî, hemî koma ku ji heşt şirinçevan, şeş dermansaz, bist û du hekîm, kesê ku dê bibe hekîm, heştê cerahên govendgêr, û duduyên dengbêj pêk hatiye derdikevin ser sehnê, û heryek li gor rêza xwe cîhê xwe digre.

SEROK

Zanayên zaneyan *doktores*
 Hekîmên hekîman *professores*,
 Kesên ku rûmet dane civata me,
 Û hûn, mîrzayên din ên birêz,
 Hûn cerah û dermansazên
 Ku biryarên Fakulteya me
 Bê lamûcîm cîbicîh dikin,
 Kesên ketine vê civatê,
 Silav, rêz û pere li we bibarin,
 Ji we hemîyan re noşîcan be dibêjim.

Hevpîşeyên min ên zane,
 Ez bixwe bextewer û heyran im
 Çi îcadekî xweş e
 Ev pîşeyê hekîmtiyê
 Çendî tiştêkî rind, kişfeke baş e,
 Hekîmtî ye, pîroz e,
 Ku mirov bitenê navê wê jî bibîr bîne,
 Mirov mat dike, mucîzeyan pêk tine,
 Bi sal û deman e,
 Her cûre mirovan
 Bi hêsanî dide jîyan.

Li ser rûkê vê erdê,
 Em mirovên herî navdar in,
 Çi hejar û çî zengîn
 Destên hemî mirovan ji me nabin.
 Hemî دنیا bazdide li pey piçek derman,

Me weke Xwedê dibînin,
Him mîr û him kizîr,
Li ber reçeteyên me gişt stuyê xwe diçemênin.

Wê gavê divê hevpişeyên min,
Em bi rastî jî bi tedbîr bin,
Bi şev û bi roj bixebitin,
Da ku karibin biparêzin
Vê hemî bawerî, nav û rûmetê,
Û her wiha divê em şiyar bin,
Gava hekîmekî bigrin nav vê civatê,
Divê em zanibin kî dikare,
Û kî hêja ye ku dagire,
Vî cîhê pir bi qîmet û rûmet.

Ji bo wê min hûn vexwendin vê derê:
Da ku hûn pirsan ji kesê nûhatî bikin,
Zanîna wî di derbarê hekîmtiyê de bipîvin,
Wî îmtîhan bikin,
Karebûn û hûnerê wî nas bikin,
Li ser biryar bidin,
Bê hêjaye ku bibe hekîm.

HEKÎMÊ YEKÊ

Birêz serokê me hekîman,
Û hûn zaneyên bijîşkan,
Ku hûn destûra min bidin,
Ez ê ji xwendekarê delal û hêja bipirsim;
Çima efyon mirov di xew vedike?

XWENDEKAR

Ev zanayê hekîm ji min dipirse,
 Aya ji bo çi efyon di xew vedike?
 Bersiva min ev e:
 Efyon dixew vedike,
 Ji ber nebata ku navê wê efyon e,
 Xwedî taybetmendiyeke
 Ku hisên mirov di xew vedike.

KORO

Baş, xweş, qenc, rind, bersiv da
 Hêja ye, layiq e ku bikeve,
 Civata me zanyaran,
 Xweş û baş bersiv da.

HEKÎMÊ DUDUYAN

Bi destûra Serokê me,
 Zanyar Fakulteya me,
 Amadebûyên civata me,
 Ez dixwazim vê bipirsim, ji zanyar xwendekarê me,
 Divê mirov kîjan dermanî binivîse
 Ji bo nexweşiya bi navê hydropsie
 Wê çawa rihet bike?

XWENDEKAR

Divê made û rêvî bên şuştin
 Paşê xwîn ji nexweşî bê girtin
 Dawiyê jî dermanê zikêşê bê dayin.

KORO

Baş, xweş, qenc û rind bersiv da
Hêja ye, layiq e ku bikeve,
Civata me zanyaran.

HEKÎMÊ SISIYAN

Bi destûra hêja Serokê me,
Zanyar Fakulteya me,
Bijarteyên civata me,
Ez ê jî vê bipirsim,
Ji zanyar xwendekarê me,
Divê mirov çi dermanan bide,
Nexweşên ku germa canê wan kêr nabe,
Bihntengiyê dikêşin,
Bi jana zirav pir diêşin?

XWENDEKAR

Divê made û rêvî bên şuştin
Paşê xwîn ji nexweşî bê girtin
Dawiyê jî dermanê zikêşê bê dayin.

KORO

Baş, xweş, qenc û rind bersiv da
Hêja ye, layiq e ku bikeve,
Civata me zanyaran.

HEKÎMÊ ÇARAN

Zanyar xwendekarê me,
Di derbarê nexweşiyên jê hatin pirsîn de
Bersivên pir di cîh de dan,

Lê ku ez jî birêz serokê me,
 Zanyar Fakulteya me,
 Rêzdar hevpişeyên me,
 Tengezar nekim zêde,
 Pirseke min a bitenê heye jê re:
 Doh nexweşekî canê wî wek sotikê êgir
 Hate cem min;
 Her ji bîstê carekê agir zora wî dibir,
 Êşa serî ew zivêr dikir,
 Parsuyên wî jan dikir,
 Bîhnçikandinê zora wî dibir.
 De ka ji me re bêje,
 Xwendekarê me yê zana,
 Diviya min çi bikira
 Ji vî nexweşê neçar ra?

XWENDEKAR

Divê made û rêvî bên şûştin
 Paşê xwîn ji nexweşî bê girtin
 Dawiyê jî dermanê zikêşê bê dayin.

HEKÎMÊ PÊNCAN

Baş e lê ku li nexweşî
 Bibe gir hinekî
 Ê baş nebe bi vî awayî
 Divê tu çi bikî?

XWENDEKAR

Ez ê her made û rêviyan bişom

Xwînê ji nexweşî bigrim
Dermanê zikêşê bidim

KORO

Baş, xweş, qenc û rind bersiv da
Hêja ye, layiq e ku bikeve,
Civata me zanyaran.

SEROK

Li hember her fermana Fakulteyê
Her pêdiviya peyrewê
Tu yê bigrî hîmet û rêzê
Ji dilê safî niha bixwî sondê?

XWENDEKAR

Erê, ez sond dixwim.

SEROK

Di hemî miayene
Û tedawîyan de
Baş jî be, xirab jî be
Tu yê her bigrî rêzê
Ji bo fermanên yên berê?

XWENDEKAR

Erê, bi sond û qesem,
Bi navê Xwedê

SEROK

Ger nexweş ji ber nexweşiyê

Biteqe û bimre jî tu yê
 Ji dermanên zanyar Fakulteya me
 Pê ve tu dermanî bikar nêni herê?

XWENDEKAR

Erê, bi ahd û peyman
 Bi dîn û îman

SEROK

Ez jî taca hekîmtiyê,
 Vî kumê zanyariyê,
 Didim serê te
 Pirtir dikim hêza te
 Ê destûrê didim te
 Hekîmtiyê bike
 Dermanên zikêşê bide
 Hicaman bike
 Kun bike
 Bibire
 Jêbike
 Ê jehrî bike
 Kesek nikare ji te re tiştêkî bibêje.

DESTPEKA BALEYÊ

*Hemî cerah û dermansaz tîn, bi tevgerên rîtmîk serê xwe li ber
 xwar dikin û silavê didin xwendekarê ku dê nû bibe hekîm.*

XWENDEKAR

Zanyarên herî mezin ên zanyariya bi navê hekîmtiyê,

Rêvas û sînemakiyê,
Ger ez rabim pesnê we bidim dînîfî ye,
Ne rewya ye, pêkenî ye,
Weke dilopeke av niqutandina ser zeryayê
Tîrêjek zêdekirina li rojê
Û zêdekirina sitêrkan li ezmên
Lehiyan li Okyanûsê
Gulan li biharê ye.
Destûra min bidin ku bi peyvekê
Sipasiyên xwe pêşkêşî
Civata we zanyar hekîman bikim.
Ez ji xwezyê, ji dê û bavê xwe
Bêtir deyndarê qenciya we me:
Xwezayê, dayik û bavê min
Ez kirim mirov li vê dinyayê;
We jî li wan zêde kir,
We ez kirim hekîm,
Qimet û rûmeteke mezin da min
We dilê min hênik û xweş kir
Ev hissên li hemberî we
Ku ji kanîka dilê min tên
Dê her bijîn heta dawiya temenê min.

KORO

Bijî, bijî, bijî, sed carî bijî,
Hekîmê nû tu zana yî, xweş diaxivî!
Hezar salî, bixwî, vexwî, her bijî,
Xwînê bigrî û bikujî!

DESTPEKA BALEYÊ

*Hemî cerrah û dermansaz li ber muzîka enstrûmanan, çingeçinga
hawinên dermansazan,
dengê sitran û çepikan govendê digrin.*

CERRAH

Hekîmê me yê jîr bila bibîne
Reçeteyên ku nivîsîne
Miayexaneyên cerrahan
Û dikanên dermansazan
Bi dev re tije kirine!

KORO

Bijî, bijî, bijî, sed carî bijî,
Hekîmê nû tu zana yî, xweş diaxivî!
Hezar salî, bixwî, vexwî, her bijî,
Xwînê bigrî û bikujî!

CERRAH

Hemî salên wî
Derbas bin bi xêr û xweşî
Bi berket û zêdeyî
Qet kêr nebin nexweşên wî
Yên bi weba, frengî
Zatulcenbî, tawî
Xwînwerivîna mêjî
Û zikêşî!

KORO

Bijî, bijî, bijî, sed carî bijî,
Hekîmê nû tu zana yî, xweş` diaxivî!
Hezar salî, bixwî, vexwî, her bijî,
Xwînê bigrî û bikujî!

Vivat, vivat, vivat, vivat, cent fois vivat
Novus Doctor, qui tam bene parlat!
Mille, mille annis et manget et bibat,
Et signet et tuat!

BALEYA DAWÎN



Nexweşê nexweşiyê nebûya, ev piyes nedibû komedî dê bûbûya trajedî. Lehengê serekî Argan, weke pêxemberên sexte qurbanekî ku ji pesna xeber dide, bûye hêsîrê ezezî û azveriyên xwe yên bi weswese, kesekî nepenî ye, ku Molière di kesayetiya wî de derban li dijminên xwe yên ebedî; Xwedayê ku dixwaze wî wenda bike, qiralê ku dixwaze tazîtiya wî nîşan bide, xurafeyên ku weke zanyarî tîn nîşandan, hekîmtiya dema xwe, dide.

Him weke bixwaze rexneyên xwe yên di derbarê hekîmtiya wê demê de bide îsbatkirin, nexweşê rasteqîn ku hekîmtî tîrênake bi hewara wî de bê, Molière piştî pêşkêşkirina cara çaran a piyasa xwe, bi awayekî trajîk tevî maqyaja xwe ya li ser sehnê serê xwê datîne, pêncî û yek salî dimre, lê bi sedan berhemên nemir li pey xwe dihêle.